Kurdinfo.com
Platform

Hêlîna Kurdçiyan a Diyarbekirê Otel [B] Erzan Palas

Faris Medeni Marsil (1976)
farismarsil@hotmail.com

Destpêkirina kar

Nuha nahê bîra min, min kîjan rojê û mehê li Otela [B]erzan Palasê dest bi kar kir, lê tê bîra min wexta min li wê kar dikir bi efûyek giştî, girtiyên siyasî yên 12 Adara 1971 ji hefsê hatin berdan. Ev efû di Meclîsa Mezin a Tirkiyeyê de hatibû qebûlkirin û bi munasebeta 50 saliya damezirandina Cumhuriyetê bû. Efû di nivê Gulana 1974ê de ket jiyanê û "mahkûmên" siyasî ku hefsê de bûn, derdiketin. Yek ji wan jî **Edib Karahan** bû ku hin bejna wî û birûyên wî yên qalind ber bi çavê min in. Bi xwe min li otelê navê wî bihîstibû û yên otelê bahsa wî dikirin. Piştî ku bi efûyê ji hefsê derket ew jî hatibû Erzan Palasê. Ji bona derketina wî Erzan Palas gelek bi hereket bû. Piranî hemşeriyê wî û nasên wî dihatin serdana wî û li ser hefsê pê re sohbet dikirin.

Jê re digotin **Edib abê**. Edib abê yekî nuktecî bû. Di axaftinên wî de ev diyar dibû. Di sohbetê de yek camêr tam nuha nahê bîra min belkî jî **Hecî Mihemed** bû, jê pirsî ka hepis çawa bû, tehde û zilm li hundir hebû ya na? Lê ji Edib abê bersivek wernegirt. Û dewam kir û got, me li derva pir kişand Edib, ji tehda û zilma polis û eskeran me pir kişand. Edib abê hilmek ji cigara xwe kişand û bersiva wî da. Got, mademkî we li derve ji polis û leşkeran pir kişand, hûn jî bihatana biketana hundir (hefsê).

Dîsa tê bîra min wexta min li wê kar dikir, **şerê Qibrisê** dest pê kir. Tarîx 20 Tîrmeha 1974 bû. Wê demê Serokê CHPê **Bulent Ecewît** Serokwezîrê Tirkiyeyê bû, Serokê MSPê **Necmettin Erbakan** cigirê serokwezîr bû û bi hev re hukmeta koalisyonê ya CHP-MSP avakiribûn. Ji Ecewît re digotin "**Karaoglan**" û ji Erbakan re jî digotin "**Mucahîdê Qibrîsê**".

Wexta vî şerî dest pêkir, car carna êvaran elektrîka bajêr qut dikirin, digotin dê Yûnanistan Diyarbekirê bombebaran bike û ji bona wê elektrikê bajêr dibrîn. Di nav gel de li dijî Yûnaniyan propagandayek ecêb û nedîtî destpêkiribû û di nav xelqê de çîrokên ji aqil û xeyalan dûr belav dibû. Yek ji wan çîrokan ev bû ku digotin, li Qibrisê li bajarê Larnaqayê erd qelişiye û **Hz. Elî** bi şûrê xwe yê du çetel derketiye û hemû Yûnaniyan ber bi şûr ve derbas kiriye.

Wê demê bahsa îlankirina seferberlixê dihat kirin û meriv li qahweyan û kuçeyan leqayê gelek kurdan dihat ku digotin, bi dilxweşî em dixwazin herin Qibrîsê û li dijî " **Qahpe Yûnanan** " şer bikin.

Ji xwe pirê caran di Mêrgaahmedê de derbas dibûm, diçûm malê. Wê gavê mala me li kuça li hember Camiya Mergaahmedê, li hember dukana hesînger û di eynî wextê de dengbêj **Ramazan Karagoz** bû. Birayek wî jî hebû navê wî **Adil Karagoz** bû ew jî wek birayê xwe Ramazan havînan li parkên Diyarbekirê derdiket sahnê û stranan digot.

Wexta ez di Mêrgeahmedê de derbas dibûm, gelek caran li ber deriyê Otela Erzan Palasê xort rûniştibûn û min hemiyan jî wek fizyonomî nasdikir lê samîmiyeta min bi wan re tunebû. Carek dîsa ber derê Otelê de derbas bûm, min li ser deriyê Otelê îlanek dît ku, di îlanê de li katibek ku êvaran kar bike, digeriyan. Bêyî ku ez bifikirim refleksên min yên hundirîn min tahm da ez derketim jor min got ez dixwazim li vir kar bikim. Ama wan jî got kerem bike werê kar bike. Roja din min dest bi kar kir.

Wê demê ez di liseyê sinifa yekê de bûm, ji du yan jî ji sê dersan di sinifê de mabûn û mecbûriyeta dewamiya liseyê tunebû. Tenê ez diçûm wan dersên ku ez tê de îtîmale mabûm. Ji bona wê jî ev kar tam li gora min bû, ji ber ku ez piştî nivroyê diçûm lîseyê û tenê wan dersên ku ez pê îtîmale mabûm û ew jî ancax heftê du yan jî sê roj bûn. Lê ev karê min her berdewam kir heta ber bi dawiya xelaskirina lîseyê.

Ji xwe bavê min miribû, diyek min û xwişkek min hebû. Birayên min yên din her yek bi serê xwe alemek bû ku carna bi mehan riya wan bi malê nediket. Di nav bajarê mezin de bêkes û hinek di halê xwe de, hinek jî "şeytan" lê bê deng. Derdê dinyayê davêt hundirê xwe, carna jî ji heftê carek 300 gram goşt para 3 kesan diket. Ji bona wê jî diya min ji Xwedê re duacî bû wek parsek. Yewmiya min 10 lira bû ku mehê dikir 300 lîra wê demê têra me diket.

Otela Erzan Palasê otela "kurdciyan" bû. Ji xwe qasî ku qal dikirin beriya ku navê wê bibe Erzan di muracata xwe ya vekirina otelê de navê otelê **Berzan** nivîsandine, lê navê Berzan ji aliyê îdareya wilayetê ve nehatiye qebûl kirin, ew jî [B] jê derxistine, Erzan hiştine. Çawa be gotine ev jî gotineka bi kurdî ye û li gora naveroka otelê ye û ev nav wisa maye.

Yên li wê hemû bi hev re kurdî qise dikirin û her êvar piranî eynî însan dihatin li nivîsgeha (yazîxanê) rûdiniştin, li ser Kurdistanê bi taybet jî Kurdistana Başûr diaxiftin. Wê gavê tevgera Barzanî xurt bû, ji Iraqê car carna însan jî dihatin û diçûn. Ez tam ketibûm nava kurdçiyan û ev tesîrek mezin li min kir ku ez jî bibim "kurdçî".

Nivîsgeha Otelê êvaran tijî dibû, piştî xwarina êvarê dihatin otelê rûdiniştin, yan jî li ber derê otelê nezere/pîneker dilîstin. Pînekercî hêjmarên xwe bi reqamên **erebî** dinivîsandin û wexta digotin min **"mêşa"** te xwar ken bi min digirt. Pirê caran muşteriyên Otelê re ciyê rûniştanê nedima ku ew rûnin, mecbûrî ya ew dadiketin qahweyan yan jî derdiketin odeyên xwe. Ev însan piranî merivên hevdû bûn. Yên merivê hev nebûn jî hemşeriyê wan bûn û bi hev re di navbera erd û esman de her tiştî qise dikirin.

Heta min xwediyê otelê yê rastteqîn fehm kir, çend roj derbas bûn. Ji ber ku yên ku êvara dihatin li salona otelê rûdiniştin hema hema herkes emir dida bêyî ku ez zanibûm ka ew kî ye. Lê tenê ez têdigihîştim ku min digot

miheqeq ew jî yek ji xwediyê Otelê ye. Ji xwe otelek weha bû ku ferq nedikir ku ez katibê li wê me, wexta muşteriyek dihat otêlê hin ji wan bi xwe radibûn navê wî li defterê dinivîsandin.

Bi derbasbûna rojan êdî ez jî fêr bûm ku ev otel otela wan însanan e ku her yek bi serê xwe dinyayek e. Lê dinyayeka ku her kes ji hev fehm dike, dinyayeka ku di binyada wê de kurdayetî heye, dinyayeka ku bav û kur , bira bi bira re araq vedixwar, bi hev re qaxiz dilîstin û bi hev re henekan dikirin. Ez ketibûm dinyayeka weha ku ev dinya min jî kir "hevalên" xwe.

Xwediyê Otelê kalikê **Alişan** bû. Yanî kalê **Aziz Aliş û Sileyman Aliş, Ismail Aliş, Kutbettin Aliş, Beşîr Aliş û Adil Aliş bû**. Azîz kurê **Hecî Ahmed** bû û Alişên ku min navê wan li jor nivîsandin ew jî kurê Hecî Mihemed bûn. **Hecî Ahmed** û **Hecî Mihemed** birayê hev bûn û birayekî wan yên din jî hebû di otobisê Belediyeya Diyarbekirê de şofêr bû lê ew pir hindik cara dihat Otelê. Otel ji aliyê **Hecî Ahmed** ve dihat şixulandin yanî xwediyê wê Hecî Ahmed bû. Bavê Hecî Ahmed avayiyê ji bo çend salan îcare kiribû û teslîmê Hecî Ahmed kiribû.

Hecî Ahmed mêrivekî mutewazî û gelek maqûl bû. Pir guhdar dikir, hindik qise dikir. Hergav cilê paqij li xwe dikir û herroj traş dibû. Li xwe miqayet bû. Nexweşiya wî ya astmayê hebû. Rojê çend caran tupa xwe derdixist û dikir devê xwe û pê nefesê dikişand. Serê siba nêzî seat 10:00 dihat otelê, hildiket qatên jor, tûrek davêt û dihat ber qasayê li defterê temaşe dikir, min qasaya wê şevê teslîmî wî dikir. Tebanceyek wî yê bi wesiqe hebû 6.35 bû, teslîmê min dikir, min dikir qaseya pere û ewraqan. Herçiqas pere di qasayê de tunebû jî qaseyek hesin ya mezin danîbûn ciyê katiban. Wexta diçû malê debanca xwe dîsa paşve digirt û dikir ber xwe. Êvaran hindik caran dihat otelê. Wexta bihata jî dîsa tabanca xwe teslîmê min dikir û diçû rûdinişt.
Bi roj qursiyê xwe davêt ber derê otelê li wê rûdinişt û gelek caran „mêvanê" wî hebûn.

Smaîlê Gulgulî muşteriyê otelê yê dewamî, lê bêpere bû. Hecî Ahmed li terasa otelê odeyêk dabû wî, ew havîn û zivistanê, payîz û biharê wexta li Diyarbekirê bûna li wê odeyê dima.

Otel Erzan Palas li Diyarbekirê li ser cadeya Mêrgaahmedê bû. Telefona wê 1004 bû. Tevî dikanên binî û terasa wê ya jor 5 tebeqe(qat) bû 3 tebeqên wê û di her tebeqê 8 ode hebûn û hejmara textên (karyole) wê 42 bûn. Lê di realitê de 37 text hebûn. 5 ode aliyê rastê yê korîdarê ku pencereyên wan li cadeyê dinêrt, 3 ode jî aliyê din li kuçeyên pişt caddê dinêrtin. Penecereyên wan odeyan piçûk bûn û di wan odeyan de destşo hebûn. Odeyên numeraya qata yekê bi 1(yekê) destpêdikir heta numereya 8ê bû. Numeraya 1ê de 3 text, ya 7 de textek û yên din jî hemû du text bûn. Di dawiya her korîdorê de du tuwalet û banyoyek û destşoyek hebû. Hemû odayên wê 24 bûn. Di her odeyêk de maseyek pîçûk, kursiyek û dolabek cilan hebû. Ji wan odeyên ku numareyên 1 ,9, 17 sê text, odeyên 7, 15, 23 textek, yên din jî di odeyan de du text hebûn. Buhayê textek ji bo odeyên 3 textan serê muşteriyê 7 lîra 50 Kuruş, ji bo odeyên du textan serî muşteriyê 10 lîra û ji bo odeya textekê jî 15 Lîra bû. Di otelê de kalorîfer tunebû. Tenê sobeyek li salona rûniştinê hebû, ew jî bi derd û kul bû.

Qata 3em piranî xwendekar û memûr bi dewamî tê de diman. Odeyan wek xanî kirê kiribûn û dawiya mehê kiriya xwe didan. Ji bona wan hin erzanî hebû. Xwendekar piranî yên bajarê tirkan hatibûn ku li Diyarbekirê **Dibistana Perwerde** (Egitim Enstitusu) dixwendin. Ji wan xwendekaran 3 yan 5 kes jî ji Elezizê bûn. Bêdeng bûn, sportmen bûn lê me ji wan şik dikir ku ew faşîst in.
Memûrekî ji **Anqerê** hebû di Banqeya Merkêzê de kar dikir li Otelê dima. Navê wî **Mehmet** bû yekî efendî û mutewazî bû. Odeya wî numeraya 21 bû. Li odê bi serê xwe dima. Dawiya mehê wexta kirêya xwe dida miheqeq behşîs dida min.

Lê ji ber ku karê otelê baş nemeşiyaye, beriya ku min dest bi kar kiribû **Hecî Ahmed** nivîsgeha otelê kiribû restorant û di qata yekê de, odeya numeraya 1ê jî kiribû odeya runiştinê ya muşteriyan û li hember odeya 1em odeya 8em ji kiribû mutfaxa restorantê. **Weysî** yê birayê **Asim** (ku aşxaneya wî li Derê çiyê bû û pir bi navû deng bû û navê wê **Asim Kebab Evî** bû) şirîgê restorantê bû û restorant baş kar dikir. **Alî Hoste** xwarinpijek jîr bû û bi tirşika (guweca) xwe meşhûr bû. Demek li Anqerê jî mabû û di restorantekê de kar kiribû û ev zîrektiya wî ji tecrûbeyên wî dihat.

Li ber derê odeya rûniştinê nivîsgehek piçûk çêkiribûn û tê de maseyek, kursiyek, kaseya pereyan û çaviyên mufteyên otelê hebû. Ev ciyê katibên otelê bû. Numeraya odeya 2em a katiban bû, heta otel tijî nebûna katib wê odê nedidan muşteriyan. Ji ber ku ev oda kêleka nivîsgehê bû, wexta em radiketin pîrê caran me deriyê wê vekirî dihişt, muşterî wexta serê sibê zû terka otelê dikirin, da ku me bibînin û me şiyar bikin û em deriyê otelê ji wan re vebikin, me wê odeyê hilbijartibû. Pirê caran li gel katibê şevê yê ku bi roj kar dikir jî li wê radiza yan jî wan xortên ku otelê bûn carna nediçûn malê li wê radiketin. Ji xwe ez bahsa **Mehmed Genc** nekim ku demek ew jî di otelê de kar kir, otelê wek mala xwe bi kar daniya. Bi şev jî nediçû malê ew jî bi şev li wê radiza. Heta ew cil û bergên xwe hemû anîbû otelê û di numeraya 2em ya katiban de bi aweyekî muntezam bi cî kiribû. Ji xwe merivekî pir tîtîz bû.

Li bin otelê li ser cadeyê li tenişta aşxanê, dukandar **Mihemed** hebû, heta derengî şevê dikana wî vekirîbû, li kêlaka wî du dukkan hebûn wek depo dihatin bi kar anîn lê hergav derebeyên wê girtî bûn û ev jî kêrî "muşteriyên dewamî" yê otelê dihat ji ber ku ew kursî û masayên xwe li ber van dukanên girtî dadaniyan û pînîker/nezere dilîstin. Lê kêleka wê jî "**Dondurmacîyê Roma**" hebû. Li aliyê çepê yê otelê dukanek hebû xwediyê wî **Abdulkadir** bû, zebaşan difrot, lê kêlaka wî qahweyek hebû ku otela me jî muşteriyê wê qahwê bû. Me çayên xwe li wê siparîş dida û şagirdên wan çay dianiyan. Xwediyê û karkirên van dikanan ji bona îhtiyaciya xwe ya tuwaletê, tuwaletên otelê bi kar dianîn.

Gelek ciwanên çeleng yê Otelê û hevalên wan li ber derê otelê rûdiniştin. Li ser tabeleya otelê telefona otelê jî hatibû nivîsandin. Numereya telefonê **1004** bû. Wê demê telefon wilo mala herkesî tunebûn, hin gelek likus bûn. Gelek keçên xama bi malbatên xwe re ber bi otelê de derbas dibûn û çavê wan li hêjmara nimareya otelê dikêt. Êvar dibû yan jî çend roj şûnda bi şev dereng telefonê otelê dikirin. Xwe dikirin dewsa muşteriyan û digotin ka ciyê vala li otela we heye ya na. Bi vê minasebetê carna bi seatan sohbet dikirin. Me jî fehm dikir ku ew ne muşterî ne dixwazin sohbet bikin. Me jî bi dilxweşî û kêfxweşî bi wan re sohbet dikir.

Carek ji caran dîsa êvareka dereng zengila telefonê lêket. Wexta zengila telefonê lêdiket ama kî nêzî telefonê bûna wî bersiv dida. Bavê Alişan Hecî Mihemed telefonê rahişt, em yên li wê ji axaftina wî, me fahm kir ku dîsa ew keçên ku ber bi otelê ve derbas bûne yek ji wan e, telefon dike. Dîsa keçik xwe xistibû dewsa muşterî û digot ciyê we yê vala heye ye yan na. Lê **Hecî Mihemed** (Xwedê rexma xwe lê bike û axa wî her adan be) meseleyê fehm kiribû ku ew ne muşterî ye. Bersiva wê da û got, keçê cî li otelê heye û em 10 kes li vir rûniştine, ku tu me hemûyan "**îdare**" bikî werê. Em hemû keniyan û telefon hat girtin. Dêrikî însanên kêfçî, henekçî û xweşsohbet bûn.

Min bahsa telefonê kir. Wê demê gelek kes û dost dihatin otelê, dixwestin telefon bikin. Zêdetir telefonê nav welatî bûn. Me berê telefonê postexaneyê dikir, me digot telefona me ev e, em dixwazin bi filan bajêrî re bi vê numereyê re biaxivin. Postexane telefonê girêdida û telefonê me dikir, digot telefona we amade ye. Carna mişterî bi seatan benda girêdanê dima. Muşterî wexta di telefonê de kurdî qise dikirin telefona wan dihat qutkirin û dîsa vedibû, digotin begefendî bi zimanî Tirkî qise bikin, ew jî ji bona ku telefona wan neyî qut kirin, mecbûr bi tirkî bi hev re diaxiftin. Piştî axaftinê me telefonê ji destê muşterî werdigirt û heqê axaftinê ji postexaneyê dipirsî, yên postexanê heqê telefonê digotin û me perê telefonê jê wan digirt û di deftera otelê de dinivîsand. Me gelek caran bi wasiteya postexaneyê telefon girêdida, êdî keçikên li wê kar dikirin bêyî ku navê me zanibin jî dengê me nas dikirin bêyî ku me nimareya xwe bigota, wan digot hûn ji 1004 telefon dikin, me jî digot erê.

Meleyên kurdçî, Smailê Gulgulî û Xalê Sirrî

Otela Erzan Palas tam merkeza "Kurdçiya" bû. Xeynî meleyên Kurdçî, **Şoreşgerên kurd** yên ku li metropolan dixwendin wexta dihatin Diyarbekir berê xwe didan vê otelê. Ma kî li vê Otelê nemaye? Ma odayên vê hotelê nebûne şahidê çî? Ku ev ode û korîdorên otelê zimanê wan hebûna û çavê wan bidîtana ka li wê çi qewimiye dê qala çi bikirana û çi nekirina!

Meleyên **Kozluxê**, yê **Batmanê**, yê **Kurtelanê** ma kîjan „meleyê kurdçî"

nedihat li wê? **Mele Mihemed, Mele Arif, Mele Salih, Mele Hesen** nizanim kîjan mele? Carna di korîdorên otelê de ji meleyan derbas nedibûn. Hemû dudo dudo bi dizî guhên hevde ji hev re tiştan digotin, wer xuya bû hemû ìllegal bûn û îllegal kar dikirin û sirê xwe vedişartin. Ev mele pirani bi roj dihatin otelê li wê „karên xwe yê îllegal" dikirin û ber bi êvarê diçûn mal, bajar û bajarokên xwe.

Carna pirs di serê me de hebû, em difikirin ji wan kesan bipirsin lê me cesaret nedikir. Ji ber ku îlegalîteyek wilo hebû ku pîvana wê li kêrê dest pê dikir û li ku xelas dibû em pê nizanibûn. Nêzî sê salan ku min li wê kar kir, hin ez bi xwe nizanbûm, Hecî Ahmed endamê partiyê ye ya na. Mademki têkiliya wî bi partîyê re tunebû çima evqas însan dihatin li vir. Ez bahsa PDK a Tirkiyeyê dikim. Her weha rewşa yên din jî wisa bû.

Êdî ew îlegaliteya wan tesîr li me xortan jî kiribû û li ba me jî bibû kulturek. Em jî bi hev re bi dîzî bipeyivîn, **Abdurrehman Guceyir (Apo)** di vî warî de gelek ekstrem bû. Carna bîlesebeb û fizûlî ba însanan dikir û di guhê wan de tiştek pisepis dikir û diçû.

Dihat gotin ku payizê wexta tene radikirin û bênder dadaniyan ev mele li gundan digeriyan û ji bona partiyê zekat berev dikirin. Rast direw wê gavê hin gotin dihat guhê me jî ku hin ji wan dewlemend jî bûne.

Lê wizyona wan ya ku gêncan bikirana hevalê xwe tunebû û ez rastê xebateka wan ya weha jî nehatim. Lê weletperwer bûn. Piştî têkçûna tevgera Barzanî êdî hatina wan ya otelê kêm bû. Lê di şûna wan de xwendekar û mamoste dihatin otelê. Êdî bayek rabibû ku minaqeşe dest pêkiribûn û saf ber bi zelalbûnê ve diçû.

Yên ne mele jî dihatin otelê. **Eyyub Alacabeg** li ber xwediyê otelê ciyek wî yê taybet hebû. Ew kêm cara dihat otelê, lê wexta li otelê bûna ew û **Hecî Ahmed** qursiyên xwe davêtin ber derê otelê û bi hev re sohbet dikirin. Ji bona Eyyub dihat gotin ku ew jî dema hereketa Barzanî de çûye Kurdistana başûr û di şerê pêşmerge de rutbe jî wergirtiye. Belkî ji bona vê yekê bû ku ciyek wî yê taybet di nav Dêrikiyên ku dihatin Otelê de hebû.

Mahmut Alcabeg di bankayê de memûr bû, ew jî êvaran gelek caran dihat otelê. Her weha **Weysî** , **Abdurrehman(Benî)** û birayekî wan yên di hebû navê wî **Nurullah** bû, ew jî li Elezîzê toplum polîsî bû, wexta dihat Diyarbekirê ew jî her şev li otelê bû. **Şehmus Dip** mamoste bû û merivê xwediyê otelê bû ew jî êvara dihat otelê.

Azîz Aliş Fenê dixwend bi wî re **Şefîk Epozdemir**, **Hadî Aydin, Mehmet Oruc** û çend kesên din dihatin otelê. Mehmet Oruc pişt re qeyda xwe rakir Stenbolê. Dawiyê **Asim** û **Kutbettin Alis** jî di nav grûba Fenê de ciyê xwe stendin. Li wê Fakultê **Mustafa Fislî û Omer** hergav bi hev re bûn ew jî gelek caran li gel yek-du kesên din dihatin otelê. Yek ji wan kesan **Murad Ciwan** bûye di sohbetek me de bahsdikir, lê sîmaya wî nahê ber çavê min) **Mahmud Lewendî**, **Haşim Ozkoyuncu** pirê caran bi meleyên ku dihatin otelê û bi gundiyên Qercedaxê re li qahweyê yan jî li ber derê otelê bi hev re rûdiniştin. **Lewendî** dama xweş dilîst. **Haşîm** dewlemend bû, xwediyê gund bû.

Dr. Fewzî û bireyê wî car carna dihatin otelê, **Selhettin Bulut, Alişan Mercan, Seyithan Mercan** û gelek kesên din ku li Diyarbekirê xwendekar bûn yan jî wexta dihatin Diyarbekirê riya xwe li otelê dixistin.

Ahmed Oruc hebû, gelek henekçî bû, ji Dêrikê bû û şofêr bû. Ji xwe Dêrikî gelemperî kêfçî û henekçî bûn. Wexta riya wî li Diyarbekirê diket dihat otelê dima û dereng radiket. Ji min re digot derê otelê negire, belkî „**qismetek**" bê, wexta qismet hat îlahî haya min pê bixe.

Mahmut Alacabeg welatparezek hêja û şoreşger bû. Carek min ji qahweya cîran çay xwestibû û şagirtê wan çay anî bû. Qayişê şagirtê qewecî bala Mahmut kişandibû ku tokaya qayişê wî rismê gur li ser bû ku sembola **MHPê** îfade dikir. Mahmûd ji min re got, ka ez te bibînim, here wî şagirtê îqna bike, bila wî qayişê xwe bi kar neyne. Hema ez çûm qehwê, di rê de ez fikirim min got ezê bi nermokî û bi provakatîf wî îqna bikim.

Min got, birê min ev çi ye, tu hem tirkî nizanî him jî wî qayişê MHPiyan li pişta xwe girê didî. **Şagirt** aciz bû, got çawa ez **tirkî** nizanim, yên li otelê rûdinên ew bi **tirkî** nizanin. Min got birê min tu bi tirkî zanî lê tirkiya te û bejn û bala te ne ya **Bûrsayîya** ye. Şagirt dîsa aciz bû got birê min ma ez ji Bûrsayê me ku tu bahsa wan ji min re dikî. Min got birê min, ma tu tirkiya **Bûrsayîya** nizanî çima wî qayişê bi kar tînî. Wî jî got ma tenê yên tirkiya Bûrsayî zanin û Bûrsayî tene ev qayiş bi kar tînin. Min got herê. Ew sembola turkçiyan e û yê kesên wek Bûrsaliya bi kar tînin. Ev gotina min wer xuya bû, jê re zahmet hat û mahneya Bûrsaliya fehm kir, got birê min em ji Alipaşayê ne û Allahina kadar ji **Alipaşayê** ne (taxeka Diyarbekirê ye) û Alîpaşayê bi deh Bûrsayê û Bûrsaliya nagehurînim.

Ez vegeriyam otelê, Mahmut pirsî ka min çi kir. Min got wexta carek din wî çay ji we re anî tu yê binêrî, ka ew ê wî qayişê bi kar bîne ya na. Piştî çend rojan wexta wî çay anî, ew qayiş li ser pantolonê wî tunebû. Êdî ez û wî bibûn dostê hev. Yek ji gedê bajêr bû.

Mahmûd Alacabeg, zanibû ez bi roj diçim Lîseya **Ziya Gokalpê**, ji min re digot di sinifê de rabe, bêje, ez kurd im. Ji xwe mekteba ku ez diçûm ji xeynî wan zarokên alayê ku bi enterê dihatin mektebê, me ji wan re digot, „**enter Çocuklari** (zarokên enterê) (enter ji wan otobusên ku wek minubusan bûn ji wan re dihat gotin) yên din piranî kurd bûn û tu munasebet tunebû ku hema ez rabim bêjim **ez kurd im**. Hêla din em ciwan bûn keçikên xweşik di sinifê de hebûn, wexta min bigotana ez kurd im gelo dê şêla wan li hember min çi bûna? Wer hasil ez du dil bûm, di rê de wexta diçûm mektebê, min digot ezê sebebekî bibînim ez ê îro bêjim ez kurd im, lê wexta diçûm diketim sinifê min li rewşê dinêrt, min dev ji ya xwe berdida. Ji xwe min ji balkişandinê û fortavêtinê tu carî hes nedikir û însanên wilo jî zêde kêfa min ji wan re nedihat.

Lê di sala dawiyê de ber dawiya xelaskirina Liseyê de min daxwaza Mahmûd anibû cî. Di dersa **Milî Guvenlikê** (Ewleyîya Milî) de ku albayek dihat dersê û xwe bi gotina Diyarbekiriyan wek „**xêvo**" (saf, aptal) nîşan dida. Min, di dersa wî de sebebek dît ku min got cendirme li gundan tehdê li gundiyên me kurdan dike. Ez li benda reaksiyona wî bûm, lê heyret mam ku qet dengê xwe nekir, tu reaksiyon nîşan neda tenê guhdarî kir.

Wexta ez di Nîsana 1980ê de di xala 171ê de bi 8 sal hatim cezakirin ev albay yek ji wan hekimê mahkema Orfî Îdare ya Diyarbekirê bû ku ew li dij vê xalê derket û ew daxwaz dikir ez di xala 125ê de bêm mahkûm kirin û ev xal jî cezayê îdamê bû. Nizanim, ew li gora qanûnê vî cezayê ji min re dixwest ya jî wî naskiribû ku min di dema lîseyê de di dersa wî de gotibû, cendirme li kurdan tadeyî dikin.

Bi navê Lutfî albayekî mudurê hefsa numareya 1ê a Diyarbekirê jî hebû ew jî wek mamosteyê Milî yê Guvenlikê ku dihat dersa me xwe „xêvo" nîşan dida. Lê wer xuya ye ev bi gelemperî taktîka eskeran e.

Abdulrezakê temûrvan jî yek ji wan kesan bû ku bi çêran/sixêfan gotinên xwe dida qebûlkirin. Digot, **„Ez ciya xwe nim ku ev ne weha ye".** Ew jî wexta Diyarbekirê bû li Otelê radiza û Hecî Ahmed pere jê nedigirt, ji xwe pereyê wî tunebû ku heqê otelê bida. Carna diçû daweta li tembûrê dixist û çend quruş pere qezenc dikir. Ber bi nîvroyê radibû dihat salona otelê. Tembûra xwe dikir destê xwe û li tela wê dixist û disitiriya, digot; „**Werin sêva, werin sêva**"……..Li hember otelê, Pasaja Qibrîsê hebû û tê de dukanek kasetçî hebû. Wê demê dengbêjek bi navê **Hakki Bulut** hebû û herroj strana wî ya „ **yeterki gel bana, kim olursan ol** " lêdixist û dengê mikrofonê bilind dikir.

Xalê Sirrî gelek caran beriya nivroj dihat otelê, ew û Hecî Ehmed ber derê otelê rûdiniştin û bi hev re sohbet dikirin û carna jî domîno, carna jî dama dilîstin. Hecî Ehmed û Xalê Sirrî dostê hevê qenc bûn. Sirrî burokratêk bû û mudurê wê postexaneya Diyarbekirê bû ku me herroj bi wasiteya wê telefonê bajarê din dikir. Ew jî ji Dêrikê bû. Wê demê nizanim lê piştî çend salan di hin sohbetan da di derheqê wî de jî tiştên bi şaîbe dihatin gotin û bi mêjiyê nuha wexta meriv difikire, bi mantiq tê. Ji ber ku li piraniya dewletên dinyayê bi taybet jî dewletên paşdemayî de poste, telefon û telgraf di bin kontrola îstixbarata dewletan de ne. Ne ji aqila dûr e ku postexaneya merkezî a Diyarbekirê jî ne di vê mekanizmayê de be.

Xalê Sirrî dişibiya artistê Tirk **Hulusî Kentmen**. Ew merivekî babacan bû, hergav bedil li xwe dikir, gelek qelew bû û qayişê xwe bi ser milê xwe de derbas dikir û bi pantorê xwe ve girê dida. Foterê li serê wî li bejna wî dihat. Sempatîk û henekçî bû; bi dengê bilind dikeniya û simbilê xwe yê sipî ba dida.

Ji xwe ez nizanibûm, mudurê postexanê ye. Carek ji caran dîsa dostek wan dixwest telefonê Stenbolê bike,me telefona wî girêdabû, lê gelek wext derbas bû telefona wî dernediket. Me çiqas telefonê postê dikir, me digot telefonek me yê Istenbolê hebû, çibû, wan digot hin ne amadeye. Wê çaxê Xalê Sirrî jî li nivîshegê rûniştî bû. Ji min re got, xwarzê ka telefonê bide min, ez bi wan re xeber bidim. Min telefonê da wî, ew aciziya xwe nîşan da, got, keça min zû telefona vî camêrî girê bidin. Keçika postexanê dengê wî nas kiribû û zanibî midûrê wê di telefonê de ye û emir dide wê, di nava çend deqîqeyan de telefona wî camêrî hatibû girêdan.

De ez bahsa **Smaîlê Gulgulî** nekim ku ew bi temenê xwe yê derbasbûyî „analîzên" wilo kûr dikir ku meriv matmayî dima. Li ser cudabûna miletê kurd û zimanê kurdî nimûneya wî hazir bû û gelek caran vê nimûneyê tekrar dikir. Digot mesela gotina „ **Bîr** ", bi kurdî **hafiza** ye, yanî tiştek di bîra min de ye, bi erebî „Bîr", **bîra avê** ye û bi tirkî „Bir" **reqam e**, yanî reqama yekê ye.

Bi wî halê xwe yê fekîr lê bi gurûr û bi wî emrê xwe yê derbasbûyî lingek wî li

Zaxo û **Dihokê** bû yê din jî li **Dêrîka Çiyayê Mazî û Diyarbekirê** . Wî qala şerê Barzanî û bi taybetî jî şerê **Çiyayê Metînan** dikir ku çawa pêşmerge helîkopterekî **Saddam** bi tifinga **„Birno"** anîbûn xwarê. Bi zewq û heyecanekî wilo û bi mehan ji însanên cûda re tekrar dikir ku ne mumkun bû yekî kurd bi guhdariya wî û vê bûyarê tesîr lênekirina û nebûna „kurdçî".

Smaîlê Gulgulî însanekî kurdperwer bû. Jê re digotin **Mamê Smaîl**. Emrê wî nêzî 60 salî xuya dikir û bêyî seatên xewê hergav cigara wî ya bi titûna sert pêçayî serê darikê wî yê dirêj ku teqrîben niv metre de, bû. Kêşandina cigarê û sertbûna tutûna wî kuxikek dabû wî ku bi şev olana kuxika wî dihat heta qata herî jêr. Carna kuxikek wilo pê digirt ku heta serê sibê dewam dikir. Ji ber kuxika wî carek muşteriyek me yî ji Stenbolê di nîvê şevê de terka otelê kir û çû. Lê muşteriyê **Stenbolî** di nav evqas otelên Diyarbekirê de gelo çima hatibû vê otelê, bi xwe min fehm nekiribû?

Mamê Smaîl ezeb bû, di wî emrê xwe yî derbasbûyî de ji jiyanê hes dikir, bedlek wî hebû li gora demê nebû, lê dîsa paqij xuya dikir. Şewqeyî wî yê hinek mezin û şeş goşe tim li serê wî bû. Nizanim tirkî zanibû ya na, xeynî şevek ez tu carî nebûm şahid ku ew bi tirkî axaft. Ev şev jî şevek taybet bû ji bona wî.

Yeka **hemşîre** bû. Li gora ku digot li **Bismîlê** hemşîretiyê dikir û ji bajarê **Eskişehrê** bû. Beriya ku ji Bismîlê biçûna Eskîşehrê riya xwe li Diyarbekirê dixist û li otela me radiza. Cara yekem wexta hat otelê ez ne li otelê bûm. Wê şevê min xeber nedabû otelê ku min ê dereng dest bi kar bikira. Wexta min li qahweya ku em lê rûniştibûn telefonê otelê kir, **Abdurrahman Guceyir (Apo)** bersiv da. Apo jî yek ji hevalên me bû wê demê ew jî di Liseya Diyarbekir de dixwend û ji Dêrikê bû û hergav dihat Otelê. Apo merivekî hinek bibalkêş bû, bi hereketên xwe dixwest balê bikşîne ser xwe. Ew li gora me hin mezintir bû. Feqîr û bêçare bû, pir cigare dikişand û pir qise dikir.

Apo di telefonê de bi heyecan bû, ji min re got ecele werê jinek hatiye otelê min cî da wê, lê divê tu bêy, navê wê li defterê binivsînî. Mecbûr ez çûm otelê. Enteresant bû, wê şevê Apo tenê li otelê bû. Apo wê dabû odeya numare 11an. Ev odeya me xortan bû ku em bi roj li wê rûdiniştin; li wê radiketin, minaqeşe dikirin, dixwendin, tembûrê dixistin û li Gulê mêze dikirin. Ez çûm odeya wê min nav û meslekê wê nivîsand, lê got ezê heqê otelê sibê bidim. Piştî min, Apo çû odeya wê got ezê pê re xeber bidim, şoreşgerî û meseleya me pê bidim qebûlkirin. Apo wexta terka odeya wê kir û çû malê seat êdî ber bi 12ê şevê bû. Roja din ber bi nivroyê wexta hemşîreya me terka otelê kir bi samîyeteka wilo xatir ji min xwest çû, **Mamê Smaîl** jî li salonê rûniştibû û êdî ji rewşê weziyet derxistibû.

Ew şev bûm şahid ku **Mamê Smaîl** tirkî qise kir. Ji ber ku wê şevê dîsa ew hemşîre hatibû otelê, wexta ew hatibû otelê li salonê gelek kes wê dîtibûn û di nav wan kesan de yek jî Mamê Smaîl bû. Mamê Smaîl nas kiribû ku ew jina ku berê dîsa hatibû otelê û wexta terka otelê kiribû ji min re nêzikayî nîşan dabû.

Min meselê fehm kiribû, ji bona ku „muşterîya" me aciz nekin, min kêleka salona rûniştinê odeya numereya 2em ku ez tê de radizam min da hemşîreyê. Lê mixabin her çi hîkmet bû ku wê şevê xewa wan kesên salonê rûniştîbûn ya yekê jî nedihat. **Mamê Smaîl** herî dereng di seat 21:00-22:00 de diçû radiket, wê şevê digot, îşev xewa min nahê. Ew xortên ku li wê bûn çend kes ji wan digotin êdî dereng e, em nikarin herin malê em ê îşev li otelê razên. Welhasil mesele hatibû fehm kirin.

Mamê Smaîl digot, Medenî de bes e, êdî derê jêr bigre, muşterî tunene. Min digot mamo karê otelê baş naçe otelên kêlaka me û li hember me bila bên girtin, em pey wan bigrin belkî muşteriyek bê. Ew herdu otel jî piranî di seat 1:00 şevê de dihatin girtin. Otela li hember me, otela Liciyan bû, xwediyê wî Abdulkadir birayê berber Yusifê ku dukana wî li hember otelê bû. Bi şev li wê **Serdar Roşan** wek katib kar dikir. Otelek 100-150 metre kêlaka me ya çepê hebû navê wê jî bawer im **Yenice Otel** bû, li wê jî **Ahmed** ê ku meyla wî ser **Rizgarî** bû, kar dikir. Otela Yenice radayek ji otêla Erzan Palasê pêştetir bû, Otela Abdulkadir tekrîben li hember me di kuçeyek de bû û radayek ji otêla me paşdetir xuya dikir.

Welhasil me derengê şevê deriyê otelê girt, xeynî çend lembeyên pêwîst hemû lembe hatin vemirandin. Em sê kes di odeya qata 2em de di numereya 9em de raketin. Yek ji wan **Benî** bû yê din jî **Hemîd** bû ku bi roj kar dikir. Ev ode li ber derenceyan bû û yên ku li jor dadiketin jêr, yan jî li jêr hildikşiyan jor dengê lingê wan dihat bihîstin. Di bêdengiya şevê de deng dihat ku yek hêdî hêdî dadiket jêr û çû ber numereya 2em a odeya hemşîreyê. Em jî hêdîka ji odeya xwe derketin me got ka em binêrin ew kî ye. Me di jor de nêhirî Mamê Smaîl pêxas hatiye jêr û hêdika li deriyê odeya hemşîre dixe û dibêje; **"Kız kapi açmiş ke "**, **„Kız kapi açmiş"** , ev gotina xwe çend cara tekrar kir. Lê nafîle bû, hemşîre derî jê re venekir. Bêçare mabû, wek ku bêje, „Nalet li çavê şeytên be" û dîsa hêdîka derket jor û çû terasê. Ez bi xwe raketim. Roja din Mamê Smaîl hinek bêkêf xuya dikir. **Hemîd û Benî** jî piştî çend rojan nexweş ketin, doktor teşhîs danibû ku sûzenek bûne.

Hatina Turkeş a Diyarbekirê
MSP (Partiya Selametê ya Milî) di hilbijartiana **14ê Oktombera 1973ê** de wek sembola xwe ya partiyê bibû partiyeka "anahtar". Di hilbijartinê de 48 wekîl derxistibûn û bi kîjan alî bûna ew dibû hikûmet. Di netîceya hilbijartinê de tabloya Meclîsê weha bû. CHP: 185, AP: 149, CGP:13, MHP:3, TBP:1, Serbixwe 6 **.**

MSP tercîha xwe ber CHPê kiribû û ew CHP bi hev re hukmeta koalisyonê ava kiribûn. Lê hukmet emrê wê dirêj najotibû. Piştî Hereketa Qibrisê şirikiya herdu partiyan ber bi neyartiyê ve çû. Ecewît di îlona 1974ê de îstîfa xwe da. Reisêcumhur **Fehrî Koruturk Sadî Irmak** ji bo hukmetê ava bike wezîfedar kir. Lê Sadî Irmak di meclîsê de dengên baweriyê wernegirt. Wê gavê li Tirkiyeyê li gel Meclîsa Mezin, Senato jî hebû. Sadî Irmak senator bû.

Wê demê **14 profesorên rastgir** yên Uniwersiteya Stenbolê beyanek derxistin ku digotin divê partiyên rastgir hukmetê ava bikin. Serokê APê **Suleyman Demirel** dîsa li sahneyê bû. Ew wezîfa hukmet avakirinê wergirt û hukmetek bi navê **MC (Cepheya Milî)** avakir. Hukmet di Adara 1975ê de li Meclîsa Mezin dengê baweriyê stend. MHP bi sê wekilên xwe postên girîng wergirtin; serokê Partiyê **Alpsalan Turkeş** li gel serokê MSPê **Necmettin Erbakan** û Serokê CGPê **Turan Feyzioglu** bibû yek ji cîgirê Serokwezîr.

Îcrata yekem a hukmeta MC, Midurê TRTê **Ismail Cem** ji wezîfeyê wergirtin. Li Tirkiyeyê roj bi roj rûdan diqewimîn; fikrên çep û rast tehamulê hev nedikirin û li her cî bûyar rûdidan. **TOB-DER** li seranserê Tirkiyeyê li **„dijî Faşîzmê û Buhabûnê"** xwepêşandin organîze kirin. Faşîst li her ciyê ku **Ecewît** diçû li wê li dijî wî mitîng li dar dixistin. Li Gerede û Elezizê êrîşê wî kiribûn. **Ecewît** wek antî-faşîst dihat xuyakirin.

Serokê MHP û cîgirserokwezîrê Tirkiyeyê beyan dabû ku ew ê bihata Diyarbekirê. Turkeş hatina xwe ya Diyarbekirê bi zanetî dikir. Beriya ku

bihata Diyarbekirê beyan dabû ku digot; **”Ez diçim Moskovaya piçûk”.** Wê demê li Diyarbekirê faşîst jî xurt bûn.

Di Egîtim Enstitiyê (Enstutiya Perwerde) de û Ogretmen Okulu (Dibistana Mamosteyî) de serdestiya wan hebû û heta dawiya sala 1976ê jî ew hin bi hêz bûn. Şaxa MHPê ya Diyarbekirê li Derê Çiyê bû.

Li van herdu mekteban de herroj di navbera şoreşger û faşîstan de pevçûn derdiket. Carek dîsa li Ogretmen Okulu şer derketibû û gelek kesên welatperwer û şoreşger birîndar bibûn. Du kes ji wan çene û diranê wan şikandibûn û nikaribûn devê xwe vekin. Herdû jî ji Qoserê bûn; navê yekê **Husên Duzen** yê din jî **Şêxmûs Ozengin** bû. Herdu jî li otelê diman, bi rojan min bi kevçiyan çorbe dixist devê wan. Hecî Ehmed heqê otelê ji wan nedigirt; ev ”mêvan” bûn.

Li milê rastê Aziz Aliş, Medenî Marsil, yên rûniştî; Adil Aliş, Abdurrehman Guceyir û hin hevalên Adil û Medenî yên Lîseya Ziya Gokalpê di dawetêkê de

Di Payiza 1976ê de dema vekirina mekteban û qeydkirinê de em grûbek diçûn Îstasiyona Diyarbekirê me li kimlika wan kesên ku di emrê me de ne ji trênê peya dibûn, kontrol dikir. Carek **ez (Medeni Marsil), Adil Aliş, Abdurrehman Guceyir (Apo), Haşim Ozkoyuncu û Selimê (Selim Yilmaz Bakac) camcî** ku dukana wan teqrîbên 100 metre dûrê otelê bû, em çûbûn **Îstasiyonê**. Grubek ji **Elezîzê** hatibûn me kîmlîka wan pirsî, hinek nîşan dan lê hinek qretî kirin nîşan nedan. Me da peyî wan, ber bi **Deriyê Rihayê** ve dihatin, li şûna **Baxçeyê Trafîkê** me êrîş bir ser wan, yek ji me kêr ji wan li yekî xist, yên din reviyan û em jî reviyan ji ortê wenda bûn. Carna jî em diçûn **Seyrantepeyê** wê gavê termînalê otubusên nav bajaran li wê bû, li wê jî me kontrola kîmlika dikir.

Serokê MHPê dê di 24 Hezîrana 1975ê de bihatana Diyarbekirê. Roja din li Diyarbekirê îmtîhana unîwersiteyê hebû û li gelek bajer û bajerokên der û dora Diyarbekirê gelek xwendekar hatibûn Diyarbekirê ku bikevin imtîxanê. Atmosfer nîşan dida ku dê tevlihevî çêbibe. Ji xwe roja ku hikmeta MC avabibibû li seranserî Tirkiyeyê roj tunebû ku rûdanek neqewimiya, li unîwersiteyan di navbera xwendekarên rastgir û çepgir de pevçûn çenebibûya.

Rojên germ bûn. Em ber derê otelê û li nivîsgeha qata yekê rûdiniştin. MHPiyên Diyarbekirê bi çend taksiyan ku bi afîşên serok û ablemên partiyê wan hatibûn xemilandin di nav bajêr de tûr davêtin û annons dikirin, digotin; dê Serokê MHPê û cîgirêserokwezîrê Tirkiyeyê **Alpaslan Turkeş** di **24ê Hezîranê** de seat di 16:00 li Diyarbekirê li Derê Çiyê biaxive û bangê xelkê dikirin ku ew bêşdarî vê mitîngê bibin. Ev anonsa wan bi vî şiklê du-sê roj ajot.

Roja ku Turkêş bihatana Diyarbekirê ez piştî nivroyê çûm otelê. Salona otelê tijî bû. Zilamek li wê bû ku min cara yekem ew didît. Yekî bejn dirêj bû û di nav tiliyên wî de tizbî şekeşek dikir. Him tizbiya xwe dikişand hem jî bi tirkî xeber dida têgehên şorşgerî bi kar daniya. Bahsa hatina Turkeş dikir. Digot divê meriv vî faşîstê nexîne Diyarbekirê. Navê wî **Dr. Sirac** bû.

Salona otelê qelebalix bû. Em çend xortên li wê rûniştî bi wî re çûn qahweya tenişta otelê. Dîsa eynî tiştî tekrar dikir û taktîka dida digot meriv divê "vî kûçikê reş" nexe Diyarbekirê. Piştî hinek sohbetê ew rabû çû.

Ber bi seat 16:00 em çend kes ber bi Derê Çiyê ve çûn, ji her derê bajêr kom bi kom însan berê xwe dabûn ciyê mitinga Turkeş. Wexta em gihaştin li wê, qelebalixek muntazam peyde bibû. Polîs berîkat danîbûn ne dihiştin kes bikeve meydana Derê çiyê. Li wê faşîst civiyabûn û li benda Turkeş bûn. Li hember hev sloganan davêtin, aliyek digot " **Kahrolsun faşîstler"** , aliyê din jî digot; **"Komunistler Moskovaya".** Êdî dest bi pevçûnê kiribûn, kevir davêtin hev, êrîşê hev dikirin. Polis nikaribû bi tenê tedbîran bigre û ji xwe polîs jî teref digirt, terefê faşîstan. Esker jî êdî ji kişlayê derketibû û hatibû ciyê mitingê. Polîs û esker ji bona ku qelebalixê belav bikin êrîş bir ser wan. Însan grub bi grub reviyan ber bi çar aliyên bajêr ve çûn û "Polîsê Toplum" (Wê demê kategoriyek polîs avakiribûn ji wan re digotin "Toplum Polisi" (Polîsê Civakî) wezîfeya wan ew bû ku rûdanên buyarên siyasî û civakî pêşîlêbigrin) û polis bi tankên xwe dan peyî wan. Hindik mabû tanka polis li ber wilayetê pê li min bikira, min xwe bi zorê avêt nava wan deviyên ku kêlaka cadeyê bûn.

Diyarbekir bibû qada şer, tank, esker, polis, cop, kevir, dar, hesin û barikat. Çi diket destê me, me davêt polisan. Di neticeyê de Turkeş nehat Diyarbekir, ya jî hatibû lê nehat ciyê mitingê. Eskerek û du kes hatin kuştin. Nêzî 100 kesî birîndar bibûn. Diyarbekiriyan mêrxasiyek mezin nîşan dabûn û piştî vê bûyarê navê Diyarbekir û Diyarbekiriyan li Turkiyeyê belav bibû. Yên çepgir bi heyranî yên rastgir bi dijminayî li wan dinêriya.

Wexta seat ber bi 21:00 şevê vegeriyam otelê lingek min pêxwas bû, min pêlavek xwe wenda kiribû, gomlekê min çiriya bû, pişkokên wê hemû jê ketibûn. Ser û çavê min, milê min, destê min û lingê min ê pêxas qetkirî, birandî û jêkiribûn. Me yê otelê roja din tiştê ku qewimî bû, me ji hev re digot. Ev bûyer bi rojan li Diyarbekirê hat axaftin. Ne tenê Diyarbekirê her weha li Tirkiyeyê û welatên din yê cîhanê jî bibû nûçe.

Deprema Licê

6ê Îlona 1975 bû. Orta rojê bû bi hîskirina zelzelê em ji otelê bazdan derve . Lê merkeza zelzelê **Licê** û derû dora wê bû. Erdhêjayek wilo bi şîddet bû ku tesîra wê li Diyarbekirê jî hatibû hîs kirin. Dawiyê xeber hat. Digotin Licê licî nemaya, wêran bûye, şîddeta depremê 6.9 bû, zêdetir 3000 hezar kes mirine, 7000 hezar avayî hilweşiyana. Hatin û ketina Licê hatibû

qedexekirin. Hinek digotin ku orta rojê nebûna dê hemû Licî ji zelzelê bimrana. Ji bona ku piraniya wan li dervayê Licê di nav bax, zêvî û erdên xwe de kar dikirin ew ji mirinê xelas bûne.

Yekî Licî li Diyarbekirê di taxa mala xwişka min de rûdinişt. Wexta ber derê mala xwişka min de diçû li esman dinêriya û digot, **"min dadika te niyaho, ma te ciyek din nedît, te çû li Licê xist"** . Hemû merivên xwe di depremê de wenda kiribû û ji bona ku hinek derdê xwe bîrve bike vedixwar lê piştî vexwarinê îcar zêdetir hissî dibû û çêra dikir.

Yarmetiya hukmetê kêm diçû, 10 -15 roj ser depremê derbas bibû serokê Belediya Liceyê **Halil Akgul** digot, hin ji %10 yê enkazê nehatiye hilandin. Xelqê Licê di çadiran de dijiyan, gazin dikirin. Zivistan dihat lê hukmet û rêxistinên xêrxwaz di alîkariyê de lakayt diman. Xelk bêçare bû; hicûmê daîreyên dewletê kiribûn û dagir kiribûn.

Xelkê Licê ji bona dengê xwe bilind bikin û bala raya giştî bikşînin digotin dê xwepêşandinek li dar bixin.

Dê depremzadeyê Licî ber bi Diyarbekirê bimeşiyana û kesên ku li Diyarbekirê bêşdar bibûna dê biçûna Tirelo û li wê bêşdarî wan bibûna û bihatana Diyarbekirê, Derê Çiyê guzergeha dawî bû û li wê mitîng dê dawî bihatana.

Ji xwe em yên otelê êdî me "tahma" mitinga wergirtibû, em bêşdarî mitinga li dijî turkeş bibûn û me qahra hundirê xwe valakiribû.

20 Novembra 1975 roja mitîngê bû. Em yên otelê ber bi Seyrantepê ve çûn, pêl pêl grûbên însan dihatin. Wê demê zêdê grûb tunebin, ya jî xuya nedikir. Herkes bi dil û can bêşdarê meşê dibû ku dixwestin birîna Licê û Liciyan bête pêçandin. Meşvan ber bi bajêr ve dihatin di destê wan de li ser paçên sipî û bi herfên mezin **"Depremde ölenlerin katili iktidardir." (Qatilê kuştiyên erdhêjandinê karîn e)** We demê hukmeta MC bû û yek bingehîn slogana depremzedeyiyan jî digotin, "Kahrolsun iktîdar". Piranî slogan bi tirkî bûn. Sloganek din jî hebû hemû bi hevre diqîriyan, digotin **"Denizliye apartman, Liceye yalan".** Sloganên siyasî jî dihatin avêtin. Wek "Kahrolsun Faşîzm" û hwd.

Bayek sar dihat, hemû dar pelên xwe weşandibûn, pel û qaxiz li ber bayê difriyan û ber bi esman ve diçûn. Meş gelek qelebalix bû, em meşiyan hatin Derê Çiyê; li ser navê Komîteya amadekar axaftin kirin. Hin Licî bi kurdî xeber didan û gazinê xwe ji hukmetê dikirin ku alîkariya wan nakin. Axêver piranî eynî tiştî digotin. Lê seyir bû, wê demê gotinên wilo ku daxwazên depremzadeyiyan dianîn zimên ji me re zêde enteresant û cazib nedihat. Me zêdetir ji ajîtosyonê hes dikir.

Ber bi dawiya mitîngê yekî bi tirkîyek xweş û bi ajîte xeber dida. Bahsa kurd û welatê kurdan dikir, digot ev herêm herêmeka dewlemend e û di dema xwe de Riya Îpekê di vir de derbas dibû. Lê dewlet siyasetek bi zanetî li hember vê heremê dajo û naxweze ew pêş bikeve.. Di nava qelebalixê de min yê axêvêr nedidît. Wexta ber bi pêş ve çûm min ew merivê naskir, ew meriv bû ku min li otelê dîtibû. **Edib Abê** bû.

Me xwe birçî dihişt lê bê mitîng nedihîşt, di warî mitînga de em jêhatî bûn. Em bêşdarî mitinga Mêrdinê û mitînga Farqînê jî bûn.

Hatina Dewrêşê Sado ya otelê

Nabe ku, ez bahsa wî zilamê siyasî nekim ku hatina wî ya otelê û ketina wî ya hundir bi serê xwe dibû sahneyek ji fîlimekî **Jemis Bond.** Wexta ew di wê cadeya Mergaahmedê ya mastfiroş û zerzewatfiroş de bi cil û bergên xwe yên ku di tavilê de balê dikşand ser xwe ber bi otelê ve dihat û hin dused-sêsed mîtro dûrê otelê bû, ne tenê yên me otelê, herweha ew esnafên cîranê otelê jî êdî zanibûn ku ew „muşteriyê" dewamî yê vê otelê ye. Wî merivî carna bi **bedlê reş, bi gomlekê reş, bi qirewatê reş, bi foterê reş, bi goreyên rêş, bi pêlavên reş, bi berçavika reş, di destek de şemsiyeya reş yê din de çenteyê reş yê wek Jemis Bond bi lez dihat diket otelê ku miş-mumkun bû balê nekişanda ser xwe.**

Ev zilamê siyasî careka din wexta dîsa dihat otelê îcar hemû cilên wî **sipî** bûn. **Ji foterê serê wî bigre heta pêlava lingê wî**. Yanî min piştî evqas sal hin jî fehm nekiriye ew çima wilo cilan li xwe dikir. Nizanim, Partî ji ber ku gelek îllegal bû, wî jî bi vî hawayî belkî xwe „kamûflaj" dikir. Ya jî ji xwe gelek hes dikir û ji derveyî adetan cilan li xwe dikir da ku bê fahmkirin ew bi taybemendiyê xwe merivekî cûda ye. Axir, bi çi sebebî bû ez nizanim, lê bi wan cilan, di taxeka wilo feqîr de rasterast balê dikişand ser xwe.

Ji xwe wê demê mentalitetek wilo ber însanan peyda bibû ku yên ku berçavika reş bida ber çavên xwe, şik çêdibûn ku ew merivekî tarî ye. Lê yê wî ne tenê berçavika wî, her tiştî wî reş bû.

Divê ez bidim diyarkirin, salên ku min li otelê kar kir ew ya du caran ya jî sê caran hat otelê. Lê du carên wî wek îro tê bîra min. Carek cilê reş, cerek jî cilê sipî li xwe kiribû. Wexta dihat otelê jî li nivîsgeha otelê rûdinişt û ji min re digot „birarzê ka ji min re porsiyon û nîv kebab li jêr bixwaze". Ev dihat wê mahneyê ku kebaba wî jî li ser hesabê otelê bû. Wexta kebab dihat wek **„gurê birçî** " diket ser kebabê dixwar û dawiya kebabê dianî.

Întibaya wî ya pêşîn ku li ser min hişt ew bû ku wek kesek **„parazîtçî "** xuya dikir. Piştî salan wexta min di derheqê wî de hin tiştên din jî sah kirin, ev întibaya „parazîtîçî" di ciyê xwe de bû. Yek ji wan meleyên **„îlegal "** ku dihat otelê, piştî çend salan ji min re digot, li cil û forsa wî nenirê ew yekî **„belaşçî"** bû.

Wî meleyê bahsdikir ku, wexta **Dewrêşê Sado** ji Kurdistana Iraqê vegeriyaye hatiye Tirkiyeyê, çûye teslîm bûye, îfadê wî hatiye stendin û di nav 3 rojan de ji aliyê dewleta Tirkiyê ve hatiye berdan. Hevalên wî yên partiyê îfadeya wî stendine. Wî jî **„îtîraf"** kiriye ku bi dezgehên dewletê yê dizî re li hev kiriye ku ew ê komunistên kurdan **„îxbar"** bike. Ev hemû tişt di sala 1973ê de qewimîne, lê Dewrêş hin li piyasê ye. Divê ev **„xaçepirsa"** Dewrêş ronî bibe.

Ez katibê otelê bûm, ez mecbûr bûm navê her muşteriyê otelê di deftera otelê ya rojene da binivsînim. Wê demê ev mecbûriyet hebû heta ev mecburiyet wilo bû ku muşterî diviyabû cuzdanê xwe yê nifusê ya jî pasaporta xwe jî teslim bikirana ji ber ku carna lê pir seyrek polîs derengê şevê dihatin otelê li deftera otelê dinêriyan û cuzdan yan jî pasaporta muşteriyên ku navê wan di defterê de hatibûn nivîsandin, dixwestin û kontrol dikirin.

Deftera muşteriyên otelê deftereka taybet bû. Herroj rûpelek dihat bi kar anîn. Di destpêka rûpelê de navê Otelê û tarîxa wê rojê dihat nivîsandin. Binê wê de bi dora rekamên odeyan, nav û paşnav, memleket, meslek û

heqê/fiyata otelê hebû. Ji xwe wexta meriv heqê/fiyata otelê dinîvîsand, xuya dikir ku muşterî di odeyeka çend text de raketiye. Odeyeka bi textek bûna 15 Lîra, ya du text bûna 10 lîra, ya sê text bûna 7.50 dihat nivîsandin. Lê piranî qelama qurşûnî dihat bi kar anîn. Ji ber ku muşterî carna odayên xwe nediecibandin, me mecbûr odeyê wan digehurand û wê gavê jî navê wan li hember numereya wan dinivîsand.

Navê yê bi cilên weha balkêş **Derviş Akgul** bû, ji Kurtelanê bû, meslekê xwe serbest dinivîsand. Carek dîsa hatibû otelê û li hember navî wî heqê otelê nehatibû nivîsandin. Wexta roja din Hecî Ehmed hat otelê û min kasaya wê şevê teslîmê wî kir, ew li navê muşteriyan jî dinêhirt. Ji xwe ew hergav wexta min kasayê teslîm dikir li defterê dinêriya û hesab dikir û dawiyê pere dikir bêrika xwe. Wê rojê jî wexta mîn kasaya şevê teslîm kir û nihêrî li hember navê Dewrêş heqê otelê nehatibû nivîsandin, **Hecî Ahmed** bi zimanekî nazîk got „Xwerzê zêde alaqe nişanê wî nede." Wek ku bêje heqê otelê ji wî jî bigre, min wilo fehm kir. Lê niyeta wî çibû ez bi xwe nizanim.

Di wî emrî de bi şev di otelê de karkirin him bi zewq bû lê zahmetiya wê jî gelek bû. Em pir hindik radiketin. Herî kêm me seat di 1:00 şevê de deriyê otelê digirt. Lê ev carna digihaşt seat 2ê şevê jî. Carna jî derengê şevê muşterî li deriyê otelê dixistin, em radibûn me derî vedikir û cî dida wan. Hinek serê sibê zû radibûn, mecbûrî me derî ji wan re vedikir, hinekên din digotin serê sibê zû me şiyar bike.

Piranî muşterî deriyên xwe kilît dikirin û muftê li ser derî dihiştîn. Wexta em mecbûr dibûn muşteriyek din bidana odeya wan mecbûr me wan şiyar dikir. Hinek muşterî hebûn digotin heta ji destê te bê, yekî din neda odeya min. Lê gelek muşterî odeyên li ser cadeyê tercîh dikirin ji ber ku pencereyên wan mezin bûn û hin ferah bûn. Ji aliyê din me nedixwest her odeyek bidin muşteriyek; ji ber ku carna du kes bi hevre dihatin û ew odekî dixwestin, yanî seata muşteriyan ne bellî bû, carna seat heta 11ê şevê muşterî tunebûn, hew te dinêhirî piştî wê seatê 10 muşterî hatin. Wê demê jî weha rezervasiyon tunebû ku hebûna jî ji xwe Erzan Palas ne di wê kategoriyê de bû. Ji aliyê din me nedixwest hemû odeyên otelê gemarî bibe û hemû ode çarşefên wê bên rastkirin. Ji bona van sedeman wexta min muşteriyek dida odeya du karyole, muşteriyek din dihat hema min dida cem wî.

Lê hin muşterî hebûn beriya ku navê xwe binivîsandana, li odeya dinêrtin ku bihata hesabê wan hin biryara xwe didan ku li otelê bimînin û wê gavê navê xwe dinivîsandin. Ji bona muşteriyan, me odeyên hinek paqij û manzeraya wan xweş nîşan dida. Ji ber ku di hinek odeyan de bi taybet jî di odeya numareya 10 an de biranguh (tahtekurusu) hebûn û diwarên hin odeyan jî zêde ne paqij bûn.

Meseleyek din hebû ku muşterî cuzdanê xwe û tiştên xwe yê bi qîmet teslîmê kasayê dikirin, diviyabû em biparêzîn. Lê yê teslim nekira ew berpirsiyarê emanetên xwe bûn. Ji bona wê yekê du caran giliyê otelê hat kirin, carek ez bi seatan di nezaretê de mam. Lê dawiyê derket ku muşterî dirawan dikir. Lîstik li hember otelê pir bûn, otel **"di bin çavan"** de bû.

Bi gelemperî bi her hawayî muşterî hebûn. Piraniya wan meslegê xwe cotkar, esnaf û serbest dinivîsandin. Lê gelek ji wan şofêr bûn û ji Nizîpê bûn, bi kamyonan bar daniyan Diyarbekirê.

Carna **erebên** Iraqê dihatin otelê, me di dilê xwe de digot ew dewlemend in dê li gel heqê otelê behşîş jî bidin. Lê heta me heqê otelê ji wan distend, em dihetiqîn. Bi seatan pazarî dikirin û bi kom û kulfet di odeyêk de diman.

Mehên Payiza hin **boxçeçî** ji **bajarê Adapazarê** dihatin. Bi hefteyan li otelê diman. Odeyên xwe wek mala xwe bi kar danîn û gelek şen bûn. Hemû keç û jin bûn. Gelek **xweşik** bûn, wer xuya bû **Çerkez** bûn. Bi roj diçûn tax bi tax, mal bi mal digeriyan perçeyên xwe yên ceyîz û qumaşên xwe difrotin. Hin hevalên **Dêrikî** yên ku li otelê bûn li dora wan digeriyan lê ew ne ji wan jinan bûn ku bikevin **"dafikê"** .

Divê ez vê yekê jî bibêjim ku futbolciyek **Diyarbekirsporê** ku kêfa min ji fotbola wî re dihat ew jî şevek bi lawikek re hatibû otelê da ku pê re razê. Min lawik naskiribû, berê em li taxekî rûdiniştin û di derheqê wî de dihat gotin ku ew **"homo"** ye, yanî bi tabîrên Diyarbekiriyan ew **"oglan"** e. Futbolciyê me jî **"oglancî"** derketibû. Diyarbekirspor di 1968ê de bi yekîtiya du taximan; **Yildiz Spor** û **Dicle Spor** hatibû avakirin. Rengê formeya Yildiz Sporê sor û sipî bû ya Dîcle Spor jî kesk û sipî bû. Piştî avakirina Diyarbekirspor forma Diyarbekirsporê bibû kesk û sor. Hin kes digotin ev rengê **zebeşa** Diyarbekirê ye. **Kesk rengê qalikê zebeşê** ye, **sor jî hundirê zebeşê** ye. Futbolciyê ku ez bahsa wî dikim, ji **Kluba Yildizê** bû, Diyarbekirspor dema di liga 3em de bû numareya wî **11** bû, pir bi lez bû û leqabê wî **Xoşxoş** ……..bû. Wexta ew di 11:00 şevê de terka otelê kirin çûn, lawik fehm kiribû, hat ber min, ji min li ava kir ku ez ji yekê re nebijim. Lawik digot, ew terzî ye û hostayê min e, ez jî şagirtê wî me.

Ji milê rastê ber bi çepê; Medenî Marsil, Mehmed Genc û Abdurrehman Guceyîr di salona rûniştinê ya Otela Erzan Palasê de (1976)

Di otelê de du katib kar dikirin. Yek bi roj yek bi şev. Bi şev min kar dikir bi roj jî piştî mektebê ez li otelê radizam. Katibên bi roj pirê caran dihatin guhartin. Yek dûrîdirêj kar nedikir. Ji xwe zêde jî kar tunebû. Dema ku min lê wê kar kir **Ali, Hemîd û Mehmed Genc** bi roj katibî dikirin, hersê jî ji Dêrikê bûn. Ez û **Adil** diçûn eynî lîseyê. **Lîseya Zîya Gokalpê** lê sinfên me cûda bûn. Ew jî havînek kar kir. lê ew jî wek yê din bi şev û bi roj li otelê bû. Em katibên otelê jî wexta pere ji me re lazim dibû bêy ku em ji **Hecî Ahmed** bixwazin, me di defterê de qeyd dikir ku filankes evqas pere wergirtiye. Ji xwe pirê caran wexta dawiya mehê dihat me meaşê xwe yê wê mehê bi vî hawî wergirtibû yan jî em deyndar diman. Yanî ji patronî û karkiriyê zêdetir têkiliyeka xwezayî ku ji ber xwe ve ava bibû di navbera karbidest û karmenda de hebû. Xeynî katiban jinekek karê paqijiyê li otelê dikir.

Di dema min de, **sê jinên** karkir li otelê hatin guhartin. Yek ji wan ew jin bû ku bi hatina wê çend muşteriyên otelê zêde bûn. Di destpêkê de me fahm nekir lê bi îfşakirina muşteriyek em gihaştin wê baweriyê ku ew paqijkêra me jineka ne " **paqij"** e. Ji ber ku me nizanibû ku wê berê di Otela **Ipek Palasê** de kar kiriye, xeynî karê paqijiyê yê otelê muşteriyan jî **"memnûn"** kiriye. **Ipek Palas** , otelêk li **Diyarbekirê** li **Çar rê** bû li ser caddeya **Îzetpaşayê** ber bi riya adliyê ve li ser milê çepê wê cadaye li hember Otela **Demir Palasê** di hundirê kuçeyek de bû. Ew otelek bû ku li wê **"fuhûş"** hebû. Paqijkêra me **jinebî** bû û emrê wê li ser pêncî salî xuya dikir. Li gora wê digot li **Îpek Palasê** bi navê **Gulê** yek heye ew him ciwan û him jî xweşik e û ji me daxwaz dikir digot bila ew jî bê li vir kar bike.

Bi hatina wê ya otelê çend muşteriyên wê jî dest pê kiribûn ku bên otela Erzanê. Rojek ji rojan **muşteriyek** me terka otelê kir, çû. Nêzî nîvroyê dîsa paşve hat otelê û got ku li odaya xwe **çaqmaqê** xwe ji bîrve kiriye. Herçiqas min jê re got odaya ku tu raketîbûyî hatiye paqijkirin û kilîtkiriye jî, camêr dîsa guhdarî nekir û di derenceyê de hilket jor. Min nêherî ku muşteriyê me paşve nahê min meraq kir. Ez ji hilketim qada duduyan jina paqijêr hemû odeyan paqij kiribû û derî kilîtkiribûn. Dawiyê deng ji banyoyê dihat, min fehm kir muşteriyê me bi paqijêra me re **"sefayê"** dike. Ez daketim jêr. Piştî çend deqiqeyan muşteriyê me ji kêfa devê wî hatibû guhê wî û ji derenceyan hat xwarê bi lez terka otelê kir û got min çaqmaq dît.

Lê karkirna wê li Otelê zêde dirêj najot, piştî du hefteyan wê bi xwe dev ji kar berda bêyî ku bibêje çima?

Li milê rastê ber bi çepê M. Marsil û Adil Aliş di daweta Azîz Alis de(1975)

Daweta **Azîz Alîş** bi temamî kurdî bû. Navê hevjina wî Azîze bû. Azîz û Azîze di destpêka payiza 1975ê de di hewşa mala Alişan de dawetek xweş li dar xistin. Em hemû li wê bûn. Azîz hem zave bû him jî strana digot. Strana wî ya populer **„Dilo ez bimrim dilo heyran li Kurdistanê, qebra min bikolin dilo heyran li bin vê darê"** bû. Dengê wî ne xerab bû. Ji xwe wexta DDKD

ava bû û grûba muzikê saz bû Aziz dirîgentê grubê bû û hewrweha yek ji danerê wê bû. Wê demê gelek aktiv bû. Carna debanceya bavê xwe jî dixist ber xwe û dihat otelê.

Di sala 1976ê de **Melik-Der (Melikahmet Kultur ve Dayanişma Dernegî)** hat avakirin. Ciyê wê li hember otelê di Qibrîs Pasajî de bû. Di qata 2em de odeyek kirê kiribûn. **Aziz Alis, Veysî Asker, Hayrettin Bozkurt, Kemal Polat, Aydin** û çend kesên din di birêvebirya Komeleyê de bûn. Em yên din endamê aktîv yê komelê bûn. Komele carek semînerek da gelek qelebalix bû. Semîner ji aliyê Aydin ve hat dayin ji re digotin " **Fîl Aydo** ".

Rojek, em piştî nivroyê ji mektebê dihatin. Em 5-6 kes bûn. Ber otelê rûniştin. Me bihîst ku **MTTB (Yekîtiya Telebeyên Milî yê Tirk)** belevok li qahweyan belav dikin. Kêleka Otela Yenî, **qahweya Hesen** hebû, li wê bûn. Em çûn hundirê qahwê me belavok ji destê wan stend û hemûyan çirand. Êrişê me kirin û slogan avêtin. Gotin **"Kahrolsun Komunistler û Komunîstlere olum"(Bimrin komunîst û mirin ji bona komunistan)** hema yên ku li qahwê rûniştibûn rabûn ser lingan û bi kursiyan êrîşê me kirin. Me nikaribû ber xwe bida, ew pir bûn. Em reviyan çûn nava wan kuçeyên teng yê Diyarbekirê. Me bi zorê canê xwe xelas kiribû. Lê hevalek me di nav lepê wan de mabû, têr lê xistibûn û li erdê raxsitibûn. Roja din em çûn **Nexweşxaneya Nimûnê,** serdana wî. Her ciyê wî pêçandîbû, tenê çavên wî, guhên wî û devê wî vekirîbû. Lingek wî bi çengelek ve, destê wî bi çengelek din ve hatibû dalqandin, nikaribû xwe tev bide. Bi îşaretê çavan bersiva me dida. Rewşa wî xeter bû lê tiştek ji destê me nedihat.

Dawiyê me bîhist ku yên li **Qahweya Hesen** herî pir li wî xistibû yek jê **bavê Weysî Asker** bûye ku Weysî Asker yek ji endamê birêvebirê **Melik-Derê** bû. Xwedigiravî me xwe xwediyê Mêrgeahmedê dizanibû, lê piştî vê buyarê me fahm kir ku rewş ne wisa ye.

Em dikaribûn bi **MHPiyan** ku wan nexin **Diyarbekirê**, lê em nikaribûn bi **MTTB-îslamistan** ku rûya wan ji raya giştî re eşkere bikin. Wan meseleya dîn xweş bi kar danî û **"biratiya îslamê"** kiribûn bingeha siyaseta xwe.

Xeynî dema mitîngan û hin istîsnayan otel tu carî bi tam kapasite kar nedikir. Wexta meş û xwepêşandin li Diyarbekirê çêdibûn xwendekarên kurd yên metropolan dihatin Diyarbekirê û yên meriv û ehlên wan li Diyarbekirê tunebûn ew dihatin otelê. Tenê wê demê di otelê de cî nedima û otel tijî dibû. Lê ji wan hinek pereyên xwe nedidan. Mesela yek **Bedrî Şen** hebû pir cara li otelê dima. Yekî ji Wêranşêhrî **Sebrî Kont** hebû, ew jî dima. Ev herdû meyila wan li ser **KAWA** bû.

Carek **Sebrî Kont** nêzî seat 22:00ê şevê, di kuçeya li hemberê otelê de baz dida ber bi otelê ve dihat. Pir tirsiya bû. Got, Medenî, ji yekê re nebejê ez li vir im. Min got xêr e. Got, li **DYOKD** semîner hebû. Me û **Şivanciyan** munaqeşe kir, di navbera me de pevçûn derket. Ew pir bûn, bi zorê me canê xwe ji wan xelas kir. Min jê re got meraq meke, ew vir ve nahên. Min di dilê xwe de got "ma ew li ku dizane ku meyla min jî li ser Şivanciyan ne."

Fuad Onen cuzdanê xwe yê peran li otelê bîrve kiribû. Paqijkêr wexta odeyan paqij kiribû, di bin balifê de dîtibû û anibû teslimê min kiribû. Ber bi nivroyê Fuad paşve hat otelê, got min cûzdanê xwe li odeya xwe bîrve kiriye. Min got kerem bike, ha cuzdanê te. Ew jî ji Îzmirê hatibû. Wê şevê otel tije bibû. Ji ber ku li Diyarbekirê mitîng hebû û gelek xwendekarên kurd yên unîwersiteyên metropolan ji bo mitîngê hatibûn Diyarbekirê. Li TOB-DERê û

DYOKDê diciviyan û li ser organîzasyona mitîngê munaqeşe dikirin. Mitîng li " **Dijî faşîzmê û buhabûnê"** bû ku **di 29ê Januariya 1976ê** de li Diyarebkirê ji aliyê TOB-DERê û hin komeleyên din yên demokratîk ve hatibû organîzekirin.

Fuad Onen ji Izmir DDKDê bû û di warî Marksizm û derketina ji riya wê (sapmalar) de xwe gihandibû. Carek li DYOKD (Komela Xwendekarên Xwendegehên Bilind a Diyarbekirê), de semînerek dabû û em bêşdar bibûn. Ji xwe wê demê hemû semîner li DYOKD li dar diketin û piranî jî xwendekar beşdar dibûn. **Fuad Onen** jî ji Dêrikê bû li Îzmîrê Fakulteya Zîraetê dixwend.

Di wê demê de hin merkeza şoreşgeriyê metropol bû. Xwendekarên kurd li wan deran dixwendin û siyasyet û îdeolojî li wê "îhracatê" Kurdistanê dikirin. Di dema xwepişandin û meşan de ev xwendekar ji metrepolê dihatin, em li dora wan rûdiniştin û bi seatan guhdariya wan dikir. Ew hemû bi tirkî qise dikirin. Me yê otelê yên ciwan me jî tirkî qise dikir, lê **mele** hemû di navbera xwe de bi kurdî diaxiftin. Nahê bîra min ku xwediyê Otelê Hecî Ahmed bi min re tirkî qise kiribe.

Em jî çûn xwepêşandinê. Xweşandin gelek qelebalix bû. Meş ber Istasyonê dest pê kiribû kortej di ofisê de ber bi **Daireya Bacê (Vergiyê)** de dihat jêr, ji li wê ber bi **Daireya Karayolu** û ber bi **Qerekola Yenişehrê** de derbas dibû û di milê rastê yê cadeya ku diçû Seyrantepeyê de ber bi Derê Çiyê ve diçû. Di mêşê de sloganên cûda cûda dihatin avêtin. Mamoste diqiriyan, digotin **"Meyak meyak dediler, ekmegimizi yediler" (Meyak meyak gotin, nanê me ji destê me girtin)** Wê demê bi navê MEYAK(Memurlarla Yardimlasma Kurumu) dezghek ji alî dewletê ve hatibû avakirin, xwedigiravî ev dezge diviyabû alîkariya memuran-mamostayan bikira lê ew jî sûîstimalî dikir.

Di mitingê de li gel sloganên **"Kahrolsun Faşîzm", "Kahrolsun MC"** me çend sloganên din jî bihîst. Ev slogan nû bûn û min cara pêşîn di vê mitîngê de bihîst. Yek jê **"Kahrolsun Emperyalîzm"** bû, telefûza wê ji me gelekan re zor dihat, ya din jî **"Çeko, Birûsk, Şivan, bijî Kurd û Kurdistan"** bû ku serkêşiya vê sloganê zilamekî çav şîn û çelenk ku parkeyêk eskerî li xwe kiribû dikşand û grûbek jî pê re dubare dikir. Ew kes ji **Farqînê** bû merivekî muhterem bû û navê wî Muhterem Biçimlî bû. Ji xwe wê demê şoreşger parkeyên eskerî yê kesk li xwe dikirin, simbilê xwe berdidan û cinikên xwe dirêj dikirin.

Turîstê Swêdî, Omer Çetîn û zimanê kurdî

Sala 1976 bû. Ya meha Nîsanê ya jî Gulanê bû. Şevek seat li dora 22:00 turistek Swêdî hat otelê. Çenteyê pişt li pişta wî bû û çenteyek normal jî di destê wî de bû. Wê şevê **Hecî Ahmed** jî li wê bû û ez û wî tenê bûn. Problema me ya komunikasyonê bi tursît re hebû, min çend gotin almanî zanibû lê têr nedikir. Min û turîst bi dest û serî bi hev dida fehmkirin. Piştî ku min odeyek jê re veqetand ew jî hat salonê rûnişt.

Qaxizek ji cêba xwe derxist û da min wek ku bêje tu vê adresê zanî. Navê **Omer Çetîn** û adresa wî di qaxiz de nivîsandîbû. Min jê re dida fehmkirin ku ez ev adresê zanim, sibê ez ê te bibim li wê. Li gel îşaretên dest û mil û serî min bi çend gotinên almanî lê bi giranî bi tirkî jê re digot. Hecî Ahmed jî li qoziyê li me temaşe dikir.

Carek got Medenî ma ew bi tirkî zane, ji xwe fehm nake tu jê re çi dibêjî. Hema bêhemdî ji devê min derket, min got ma ew bi kurdî dizane? **Hecî**

Ahmed di tavilê de bersiva min da û got ma Tirkî zanibûya ji xwe mesele tunebû, ji bona wê jî tu şûna tirkî de, **kurdî pê re qise bikî, çêtir e**. **Hecî Ahmed** gotinek di cî de kiribû, ez ber xwe ketim. Lê min pê re bi zanetî tirkî qise nedikir, mentalîtata me wilo bû, tirkî zimanê me yê serdest bû û ketibû xwîna me. Êdî min pê re li gel dest û ser û mil û mîmikên xwe kurdî qisê kir bêyî ku têbigihîje ez çi dibêjim. Di neticeyê de min û turist kir serê hev ku sibê ez ê wî bibim teslîmê **Omer Çetin** bikim.

Divê di vir de parantezek vekim û bêjim ku; carna hin rojnamevanên biyanî diçin Kurdistanê reportaj dikin. Rojnamevan çûye ji bona televziyona welatê xwe reportaj dike, meriv ji xeynî zimanî wî/wê rojnamevanî, bi çi zimanî biaxife, di encamê de ew, wê axaftinê werdigerîne ser zimanê xwe. Carna ez di tv Swêdî de reportajên weha dibînim ku rojnamevan çûye Kurdistanê kesên ku bi wan re hevpeyvîn dike, ew bi tirkî bersiv didin, ev tişt yekser bûyara Erzan palasê tîne bîra min ku min jî bi turîstê Swêdî re tirkî qise kiribû.

Roja din Ez û Adil Aliş ber bi nivroyê bi turîstê xwe re em çûn mala **Omer Çetîn. Adil Aliş** çentê wî yê pişt hilgirtibû xistibû pişta xwe, lê ev cara yekem bû ku çenteyêk wilo hildgirtibû, ev rewşa wî ji min re pir acêb dihat, ez pê dikeniyam, min jê re digot **" turîstê cîwar (yerlî)"** ew jî xwe aciz dikir.

Li gora adresê, mala **Omer Çetîn** li hember Belediyeyê li **pişt Xana Hesen Paşayê**, li hember **Çarşiya Necaran** (marangozan) di hundirê kuçeyek teng de di avayiyek bilind de bû. Li cem Xana Hesen Paşayê **Çarşiya Zêrfiroş** û li cem Çarşiya Zêrfiroş jî **Çarşiya Girtî** hebû. Di Çarşiya Girtî de li gel qeseban, masîfiroş, sebze û meyvefiroş jî hebûn. Em di deriyê wê yê li ser **Cadeya Gazî** de ketin hundir, rast çûn piştre li milê çepê zivirîn ber dukana Şêx Guzel de derbas bûn, di deriyê dawiyê de derketin û li milê rastê vegeriyan. Li wê Çarşiya Necaran bû.

Wexta em ber dukana **Şêx Guzel** de derbas bûn, li wê jin û hinek zarok kom bibûn û yek dudo jî hundirê dukanê bûn. Em çend deqîqe li wê sekinîn. Jin bi çarşefên reş û bi kirasên renga reng bûn û dolbend li serê wan pêçayî bû, gundî bûn. Ew hatibûn ber **Şêx Guzel** û ji derd û kulên xwe re çareyan digeriyan; yên ku dixwestin hêviyê wan bên cî, yên ku dixwestin bigihîjin mirada xwe û yên ku dixwestin zarokên wan şîfayê bibînîn. **Şêx Guzel li gora derdê wan, bi "metodên" xwe wan tedawî dikir, ji hinekan re nivîşt çêdikir, hinêkan puf dikir serûçavê wan, hinekan tuf dikir devê wan û hinêkan jî pêsîrê wan miz dida.** Turistê me bi çavbeloqî li wan dinêriya û meraq dikir, lê em bi zimanê wî nizanibûn ku jê re îzah bikin ev Şêx e û bi "metoden" xwe êşa "derman" dike.

Em çûn li deriyê Omer xistin, xanima wî derket, me got ev camêr ji Swêdê hatiye dixwazê Omer Çetîn bibîne. Omer Çetîn hat ber derî, ew û tursît bi hev re bi zimanê turîst qise kirin, ji me re got herin qahweyêk ber necaran heye, li wê rûnin ez ê piştî çend deqîqeyan bêm. Em çûn qahweyê, piştî çend deqîqeyan Omer hat, ew jî rûnişt me bi hev re çay vexwar. Zilamek hat got erebe amade ye. Ew **şofêrê Omer** bû. Omer li pêşiyê ez, Adil û turîst jî li dawiya **Renoyê** siwar bûn û em di nav bajêr de geriyan. Em çûn ser bûrcên Diyarbekirê li ser bûrcan geriyan, heta **Bûrca Heft Birayan** çûn. Omer jê re di derheqê bûrcan de agahî bi zimanê wî dida. Wer xuya bû ji hev fehm dikirin. Em nizanibûn Omer berê li Swêdê maye û bi Swêdî pê re qise dike. Me digot belkî bi hev re bi Ingilîzî dipeyivin. Xuya bû turîst rojnamevan bû, gelek dipirsiya û gelek risman dikişand û gelek rismê me jî bi hev re kişand; makineyekê wî yê fotografan ecêb hebû, di tavilê de risim jê derdixst û dida

me. Wê rojê em gelek geriyan, dawiyê Omer em birin restorantê, me bi hev re xwarin xwar û ez û Adil ji wan veqetiyan.

Teqrîben piştî salekî, wexta **ez û Adil bûn endamê PDKT (Dr. Şivan)** piştre em fêr bûn ku serokê me/vê partiyê Omer Çetîn e. Ji ber wê yekê jî wexta ez hatim girtin ev risim û gelek rismên din û kitêbên min hatibûn şewitandin.

"Taarrûza" jinên sûbayan li hember otelê

Yek ji taybetmendiyên wan xortên Dêrikiyan ew bû ku gelek ji wan li sazê/tembûrê dixistin. Em carna li odeyên otelê rûdiniştin û „tembûrvan" li tembûrê dixistin û pê re jî disitiriyan. **Selhettin Bulut, Adil Aliş, Mehmet Genc** ji wan kesan bûn. Ji bona wê jî hergav li otelê muhaqeq tembûrek peyda dibû. Strana **Mihemed Şêxo ya „Aylê Gulê, Gula min î"** yek ji wan strana wan ya populer bû ku disitiriyan. Wexta wan li tembûrê dixistin û vê stranê disitriyan, di bin çavan de li avayiya li hember otelê li Gulê dinêrtin. Gulê carna ber pencerê bû, carna jî xuya nedikir. **Gulê** yeka zerîk û xweşîk û jina sûbay bû ku çavê wê li derve bû.

Li hember otelê li aliyê din yê caddeyê avayiyek 5 qat hebû. Tam di hîzeya Otelê de bû. Navê apartmanê **"Apartmana Altiparmak"** bû. Di qata 4ê de sûbayek hebû, digotin ji Mêrdinê ye. Jina wî xweşik û şermûd bû û navê wê Gulê bû û bibû belaya serê otelê. Lê belayek bi kêf û zewq bû. Pirê caran bi îşareta bela xwe bi me yên otelê dida.

Wexta serê sibê mêrê wê yê sûbay ji malê derdiket diçû karê xwe, Gulê jî derdiket pencereyê, li der û dora xwe dinêriya. Ber bi nîvroyê wexta derdiket derve bi etekê kin, çîmê wê heta jor tazî, xemilandî bi parfûm û lewantê bîndayî ber bi dukanên esnafan re derbas dibû û esnaf di bin çavan de lê dinêriyan, gilêz ji devên wan dihat. Esnafek xwe nedigirt û digot, **"Wellehî tu dikarî miriyan jî ji mezel rakî".**

Gulê, Adil Alis wek kurê xwediyê otelê dizanibû, dîsa rojek ji rojan wexta derketibû piyasê ba Adil kiribû û bi xwe re li sûkê gerandibû; Adil biribû restorantê kebab dabû wî û piştre jî çûbûn **Pastaxaneya Şêxmûs** dondurme li ser baqlewa xwaribûn. Lê Adil fehm nekirbû, çima weha dike. Wexta Adil bahsa vê çîrokê dikir, me henêkên xwe pê dikir û me ji re digot „çaylak herif ".

Gulê fehmkiribû ku tiştek ji me dernakeve, ya jî xwe nedikir bin "rîskê" ku bihata otelê, îcar bela xwe bi yên xwendekarên ku di otelê de diman, dida. Ji wan yek ji xwendekarên Elezizê re têkiliya wê hebû û pê re reviyabû û çend şev nehatibû malê. Roja din êvarê sûbayê mêrê wê hat otelê. **Hecî Ehmed** ber derê Otelê rûniştîbû. Jê sual dikir ku şagirtên otelê haya wan ji jina wî heye, ya na. Hecî Ahmed ba min kir, ji min pirsî. Ev zabit jina xwe dipirse ma haya te jê nîne. Ji min re ev pirs gelek ecêb hatibû, mecbûr min jî rastiyê got. Min got, welle yek ji xwendekarên me yê qata 3ê yê ji Elezîzî, ew jî ev du roj e nahê otelê, wan di pencereyên xwe de carna îşaret didan hev, belkî bi hev re ne. Sûbay li min mêze kir û bêyî ku tiştekî bibêje vegeriya mala xwe.

Li avayiya hember otelê gelek keçên xama hebûn. Keçên xwediyê Apartmana Altiparmak ji wan bûn ku bi şev û biroj di pencereyê de bûn, bi îşaretan xortên otelê ji „rê" derdixistin. Herweha di **"Apartmana Altiparmak"** de li hember numereya odeya 21ê a Mehmedê bankacî keçek hebû. Ew û Mehmed gelek caran bi îşaretan li hev dikirin. Dawiyê ew û Mehmed bi hev re zewicîn.

Sal 1976 rojek ji meha Tîrmehê bû. Bi roj otel gelek qelebalix bû. Di odeyek de dîsa çend **meleyên îlegal** bi hevre qise dikirin, hin derdiketin hin jî diketin hundir. Li odeya kêlaka wê di numeraya 3em de semînera xebata perwerde hebû, em nêzî 9-10 kes bêşdarî semînerê bibûn. **Asim**ê ku di Fakulteya Fenê de dixwend kitêba **George Politzer a "Prensibên Bingehîn yê Felsefê"** di destê wî de hêdî hêdî dixwend û bi tirkiya xwe ya xweş şîrove dikir. Wexta şîrove dikir, "şorik" ji devê wî dihat. Asim yekî kêfçî bû û dişibiya artîstê tirk yê komîk **Kemal Sunal,** kena wî tam wek kena Sunal bû. Pir caran di axaftina xwe de gotina **seksî** bi kar dianî. Lê nizanibû ku di eynî wextê de li otelê di odaya 15 de ev gotina wî dihat tatbîq kirin. Dîsa ew jina sûbay bû ku hatibû otelê û di deriyê aşxaneyê de ketibû hundir.

Ew berê jî çend caran hatibû otelê, lê ev car "muşterîyê" wê zêde bûn. Me jîna sûbay bi wasiteya **hoste Elî** naskiribû. Rojek piştî nivro dîsa li otelê li odeya 11 de raketîbûm. Azîz û Adil min ji xewa şerîn şiyar kiribûn û gotibûn ku, tu li vir razê, bila hoste Elî jî di kêleka odeya te de kum deyne serê te. Min gotibû xêr e. Gotibûn here ji hoste Elî bipirse.

Hoste Elî xwarinpijê aşxanê bû, berê li Anqerê di aşxaneyêkê de jî kar kiribû. Ji ber ku xwarina xweş dixwar ser û çavê wî bi goşt û xwîn bû û lihevhatîbû. Hoste Elî berê ji min veşart, got ez wê li Anqereyê nas dikim, nasa min e, lê dawiyê ji min re got ku; ev **Dêrikî doxîn sist in,** bila di navbera min û te de bimîne, ji wan re nebêje. Ji ber ku ez û hoste Elî ne Derikî bûn, carna paşgotiniya Dêrikiyan ji min re dikir. Bahsa jina sûbay kir û got ew ê carna rêya xwe li otelê bixe. Gotina hosta Elî rast derketibû, jina sûbay carna dihat otelê.

Carek me ew taqîp kir ka em zanibin ew çi kes e û mala wê li kuderê ye. Mala wê nêzî **Qahweya Çamlicayê**, di avayiyek bilind de di qata duyem de bû. Ji xwe ji axaftina wê xuya dikir ku tirk e û tirkiyeka pir nazîk û pir bedew qise dikir. Em ne navê wê fêr bûn, ne jî me pirsî ka ew ji kîjan bajarê ye, tenê digot mêrê min sûbay e.

Divê ez bidim diyarkirin ku, wê demê sûbay jî wek memûrên din yê dewletê di nav xelkê de dijiyan, rewşa wan ya aborî wilo ne baş bû, bi meaşek debara xwe dikirin. Xanimên wan jî tor (fîle) di destê wan de çarşî-pazar digeriyan da ku fêkî û sebzeyên erzan bikirin. Yanî ne xwediyê îmtiyaziyek zêde bûn. Wer xuya bû ji bona vê yekê jinên sûbayan hem ji bona "zewqê" him jî alîkariya aboriya malê bikin diketin vê riyê.

Ew roj rojeka taybet bû. Semînera perwerde ya me xwendekaran, civîna meleyên kurdçî, trafîka hatinûçûyîna telebeyên Elezîzî ku li qada 3em a otelê diman û odeya nimareya 15 ya jîna sûbay wê rojê otelê piralîtir û rengtir dikir û otelê ji rojên din yên normal cûdatir dikir.

Di demek kin de gelek kes fehm kirin ku jina sûbay li otelê ye û li nimereya 15ê benda "muşteriyan" e. Herkes sebebek didît ku pê re bikeve têkiliyê. Yek digot, **"divê em heyfa xwe ji sûbayên tirkan bistînin"**, yekî din digot, **"belkî ajan e hatiye otelê ka zanibe çi diqewime, em firsatê nedine wê",** yekî din digot **"ma di kerxanayê de jî jinek rojê bi dehan zilaman re radizê"** , yekî din digot, **"ez tijî bûme divê ez jahra xwe vala bikim"** , yekî din digot, **"15 numera 15 cara", Abdulrezaqê temûrvan** digot, **"ez ciya xwe nim ku ez pê re ranezim, ez ê giliyê we ji Hecî Ahmed re bikim"** Welhasil di derbarê pêwîstiya biyolojîk de qelsbûn û lawaziya mêran bi aweyekî li hemer cinsîyeteka mê ya munasib xwe nîşandabû ku ew nikarîbûn xwe rabigrin.

Piştî wê rojê jina sûbay ne riya xwe li otelê xist, ne jî em rastê wê hatin. Tenê carek me sah kir ku **Abdurrehman Guceyîr (Apo)** çûye dêriyê wê xistiye ku halê wê bipirse, lê mêrê wê derî vekiriye, Apo reviyaye û mêrê wê bera Apo daye.

Li mil çepê ber bi rastê yê 2em Medenî Marsil û yê 4em Adil Aliş bi hin xwendekarên Liseya Ziya Goklapê re

Alfabeya Kurdî, Xebat, Rizgarî û kitêb
Êdî di sala 1976ê de di nav însanên ku dihatin otelê de kategorîze çêdibûn grûb derdiketin ortê.

Em gruba lîseyê, ez, **Adil Alis û Abdurrahman Guceyir** bûn. Grûbek Fakulteya Fenê çêbibû. **Azîz Aliş** Fenê dixwend bi wî re **Şefîk [Ep]Ozdemir** , **Hadî Aydin, Şefik Oncu** û çend kesên din dihatin otelê. Wan amadeyiya avakirina **DUFFOD** (Komela Xwendekarên Fakulta Fenê a Universita Diyarbekirê) dikirin. Piştî demek avakirin jî. Dawiyê **Asim** û **Kutbettin Alis** jî di nav grûba Fenê de ciyê xwe stendin. Piştî komeleya wan ava bû êdî kêm caran dihatin otelê. **Şefîk [Ep]Ozdemir** xortekî çeleng bû û herî aktîv û zane xuya dikir. Ew bibû Serokê Komeleyê. Li derveyî karê komeletiyê, siyaset jî dikirin û ji xwe komelaleyetî parçayek siyaseta wan bû. Di 10ê Desembera 1976ê de li Diyarbekirê li Balikçilarbaşîyê di arbedeya merasima cenazeyek şoreşgerek tirk de ku bi îşkencê hatibû kuştin, Maocîyan wî li ser dolmuşî avêtin xwarê û jiyana xwe ji dest da.

Êdî dema xwendinê û semîneran bû. Me dest pêkiribû em bixwînin. Yê min zêde wexta min tunebû. Wexta mecalê min çêdibû mecbûr min li gel kitêban dersan, kitêbên din jî dixwend.

Bawer im sala 1975 bû. Min cara pêşîn li otelê **alfabeya kurdî a M. Emîn Bozarslan** dît, ji min re pirr xerîb hatibû. Em xerîbê alfabeya xwe bûn, me herfan nas nedikir; lê hefteyek her şev piştî ku min deriyê otelê digirt, lê dinêriya. Serê min tevlihev bibû, min ji xwe re digot gotinên ku em diaxifin,

meriv dikare wan binivîsîne jî. Tîpa **J** bala min kişandibû ku nimûneya wê **Jûjî** bû. Di nimûnê de ne tenê **"J"** yek, du **"J"** hebû.

Hejmarek kovara **Xebat** a illegel jî min carek li otelê di dolaba salona rûniştinê de dîtibû, nivîsên wê şolî bûn, nedihat xwendin. Li gel wê jî min dixwest kovarê bixwînim lê roja din wexta min li dolabê nêhirî kovar di dolabê de tunebû. Li gel wê kovara **Rizgarî** ji me re pirr balkêş dihat ji xwe formata wê enteresant bû, A4 ber bi firehiyê bû. Em tiryakiyê wê bûn. Zimanê wê yê tirkî yê ajîtatif û şaîrane gelek tesîr li me dikir. Lê nivîsên kurdî ji me re xerîb û zahmet dihatin, gotinên ku di hin waran de bi kar danîn, me ji xwendina kurdî dûr dixist.

Em carna diçûn Buroya **Komal**ê, Komal wê gavê li Pasaja **Dîlan Sinemasî** bû. **Ibrahim Guçlu** li wê bû, tam milîtan û şoreşger bû, pir diaxivî û dorê nedida kesekî din. Me kitêbên **Îsmail Beşîkçî** dikirî û dixwend.

Carek paketek mezin ji Stenbolê şandibûn otelê. Bi şev min paketê vekir tê de kitaba **Şerefname** hebû, min yekê jê derxist û dest pê kir xwend. Wê demê Kitêb jî kêm bûn. Kitêba **Zinar Sîlopî** a "Doza Kurdistan", kitêba **Dr. Şivan** "Kurd millet Hareketleri ve Irakta Kurdistan Ihtilali" û kitêba **Hidir Murad** "Türkiye Şartlarinda Kürt Halkinin Kurtuluş Mücadelesî " di nav wan kitêban de bû ku me dixwend. Wê demê şiîra **"Nataşa"** pir populer bû.

Xeynî grûbên sosyalîst yê Pro-Sovyetik grûbên **Maocitiyê** jî derketibûn; grûbên **Halkin** "**sulalesî** " gelek û gelek bûn. **Lîs-Der** hebû, çend caran em çûn li wê jî, lê ji me re zêde enteresant nedihat, yên li wê jî wek me bûn. Me zêdetir dixwest yên ku ji metropolan tên wan guhdarî bikin. Em diçûn **TOB-DERê**. Carek kongreya wan hebû. **Grûba "Dogu Bagimsizlar"** (**Grûba Rohilat a Serxwebû**) hebû, berdevkê wê **Necdet Gundem** bû, ji ber ku navê wê **"Dogu"** bû bala me dikşand û ji me re cazîb dihat.

Di **Lîseya Diyarbekir de** herroj çalakî çêdibûn, êdî ji heddê xwe derketibû, wexta telebe dersên xwe çênedikirin bahaneyek didîtin, nediketin dersan û digotin me boykot kiriye. Abdurrehman Guceyîr yek ji wan telebeyan bû serkêşiya wê dikir. **Abdurrehman Guceyîr** (Apo) henekê xwe bi min û Adil dikir ku, **„em ketine nava wan sut çocuguyan" (Gedeyên ku şîr vedixwin)** em nikarin li Lîseya Zîya Gokalpê çalakiyan bikin.

Li milê çepê yê duyem M. Marsil û yê dawî jî A. Aliş bi grûbek hevalên xwe yên Lîseyê re

Wê demê Ziya Gokalp pir bi disîplin bû, mudurêkî wê hebû yekê ji Rihayê bû û jê re digotin **„Ît Elo".** Ev laqabê wî wusa cî girtibû ku kes paşnavê wî jî nizanibû. Yekî ji xwe pir razî bû û mala wî nêzî mektebê bû û nedihişt **„çûk li ser mektebê bifire".**

Em pola dawiyê ya Lîseyê bûn. Em 6 xwendekarên Lîseyê li otelê civiyan. Sinifa min 6 B bû, di sinifa me de ez tenê hebûm, yên din hemû di sinifa 6 A de bûn. Adil Aliş jî di wê sinifê de bû. Di nava wan de **Tekin, Ahmed** û du kesên din jî hebûn. Me biryar wergirt ku em ê çalakî li mektebê çêkin; boykot zahmet bû lê me li ser wê yekê lihevkir ku em ê sloganan li diwarên mektebê binivsînin. Şevek me boyax kirî û em çûn mektebê. Me her hes sloganek nivîsand. Para min „**Kahrolsun sömürgecilik" (Bimre Mêtingehkarî)** ketibû.

Ev çalakiya yekê bû ku li Ziya Gokalpê rû dida ji bona wê jî em hemû bi heyecan û bi tirs bûn. Yên din beriya min nivîsandina sloganên xwe temam kiribûn. Slogan dirêj bû û nivîsandina wê wext digirt. Min jî bi lez temam kir. Lê di şûna **„Kahrolsun sömürgecilik'** de min **„Kahrolsun sömürgelik'** nivîsandibû. Me got xem nake, dê bê fehmkirin. Em belav bûn herkes çû mala xwe.

Roja din wexta em çûn mektebê hemû sloganên me hatibûn xerabkirin, lê ciyê boyaxê bellî bû û herkes fahm kiribû ku slogan hatine nivîsandin. Li mektebe telaşek hebû ku her kes meraq dikir, digot kî ceseret kiriye van sloganan nivîsandiye. Îdare li wan kesan digeriya ku bibîne. **Mûsa Okan** yekî wilo bû ku dixwest hergav balêbikşîne ser xwe û pir forta davêt. Nuha paşnavê xwe guhartiye kiriye **Farisogulu** û **cigîrserokê DTPa şaxê Diyarbekirê** ye. Dema DDKD bi hêz bû ew xwe wek DDKDyî nîşan dida. Di Tenefusê de ez û **Mûsa** li sinifê li ber pencerê rûniştibûn û me li diwarên ku slogan lê hatibûn nivîsandin mêzê dikir. Mûsa pozîsiyoneka wilo dida xwe ku, îma dikir tiliya wî di nivîsandina van sloganan de heye. Slogana ku min nivîsandibû, min ciyê wî nîşanê Mûsa da, min got birê min li wê kîjan slogan hatibû nivîsandin. Birê min Mûsa got, „Birê min, tu jî pir dipirsî, me tiştek nivîsandibû îşte". Werhasil xwe kiribû xwediyê çalakiya ku haya wî jê tunebû.

Îdare pê hesiyabû û ba wî kiribû, lê fehm kiribûn ku tiliya wî di vî karî de tuneye. Piştî vê çalakiyê „**Ît Elo**" li gurûra xwe dananî, tayina xwe xwest çû, yanî îstîfa kiribû.

Piştî vê çalakiyê êdî tirsa me şikiyabû, îcar me Lîseyê carek bir boykotê. Dîsa em 6 kes bûn, em civiyan û me di navbera xwe de munaqeşe kir û me li hev kir. Beriya ku em biketina dersê em li baxçeyê mektebê diciviyan ku mudur yan jî cigirêmudur agahiyê wan hebûna didan me û em ji du aliyan de diketin hundir. Ev karekî rûtin bû ku herroj tekrar dikir. Em ew 6 kes derketin jor pêşiya xwendekaran û me dest pê kir, slogan avêt. Xwendekar jî bi yek dengî nebe jî piranî bi me re diqiriyan. Slogona me **„Boykot hakkımız, söke söke alırız " (Boykotkirin mafê me ye emê wê bi zorê werbigrin)** Hemû şaş mabûn. Ji me re gotin bila xwendekar herin dersê û hûn jî werin îdareyê, daxwaza we çî ye, bibêjin. Em çûn îdareyê. Mudur hin tunebû, wekilê wî **Mehmed Turgut** bû, ew jî wek me bi heyecan bû, li hember wî boykot hatibû çêkirin. Me digot divê ev mecbûriyeta şewqe bi kar anîn bila rabe û qirawat bi kar anîn jî bi dilxwazî be û mamoste kêfî hereket nekin û hwd. Wê gavê xwendekarê Liseya Ziya Gokalpê şewqeyek wek şewqê subayan lê rengê wê şîn bû bi kar daniyan û qirawat jî mecbûr bû. Lê gotin we sûc kiriye, yek ji wan yek ji me wek xwe kirin. Hin kesan ji bona mehek surgun kirin hinek jî ixtar dan wan. Lê ew kes hemû ji sinifa 6 A bûn. Lê êdî mecbûriyeta şeqwe bikaranîn rabibû û qirawat bi kar anîn jî serbest kiribûn.

Piştî ku li Diyarbekirê TOB-DER û DIYOD û komeleyên demokratîk û kultura qahweyan pêşde çû, êdî rola **Erzan Palas** jî kêm bû. Di sala 1979ê de carek ber bi Erzan Palasê de derbas bûm, navê wê bibû **Hayat Palas**. Lê heyata ku ez li wê jiyam ji bona min heyatêka wilo bû ku wek heyata unîwersiteyê bû.

Di Nîsana 1977ê de êdî me aktîf, militanî û legal-îlegal dest bi siyaseta rêxistinî kir. Wexta di destpêka November a 1979ê de hatim girtin, diya min a rehmetî hat serdana min ya hefsê û gotina wê ya pêşîn ew bû ku **„Ji Erzan Palasê re berdua dikir û digot, çi hat serê te sebebê wê [B]erzan Palas e."**

Helbet ev serpêhatiyên min di derheqê otela Erzan Palasê de beriya 33-34 sala nin. Min xwe li ser wan salan konsentre kir û min xwest ew çend salên ciwaniya me û ev otelê ku di warî kurdayetiyê de xwediyê dîrokekî taybetî ye bi her hawayî û bi objektîf û bêsansûr bînim ber çavên xwendevanan. Wilo li ser otelê konsantre bûm ku wê gavê me çawa qise dikir bi wî hawî jî min nivîsand û min zêda balê neda rêzimana kurdî jî.